

HELBESTVANÊ TEOESER Û HEJARAN  
LETÎF HELMET

NIVÎSÎN, WERGERANDIN Û AMADEKIRIN  
XELÎL DUHOKÎ

Enstituya Kurdi Ya Brukselê  
1998

" Ji bo bîranîna dayika Helmetî û Letîf Hamid  
Berzencî ku, mameste û hevalê Helmetî bû, pêşkêş  
e..."

PÊŞGOTIN

Nivîsin li ser helbestên Letîf Helmetî, çej û tameka taybet dide mirovî, çinku ew bi zimanekê sivik û rewan dinivîse û her zû xwendevanî radikêşe cîhana berhemên xwe. Ew bê perde, bê tem û mij, bê asteng û girê dinivîse. Ew mîna stêreka ges xwe li esmanî xuya dike. Ew ne bi tenê, ji bo girupeka berteng, hişyar û zana dinivîse, belku ji bo tevaya karker, cotkar û bisporan jî helbetan divehîne. Ew peyvîn xwe, mîna gul û rihanîn bi ser cemawerî de direşîne û xelk jî, wan himbêz dîkin.

Ew jî weke Hemzatufî dibêje:" Ez ji Xudê, hêvî û tika dikim ku, min ji zimanê min bê behir neke, çinku ez dixwazim bi rengekê helbest, pirtûk û tevaya berhemên xwe, binivîsim ku, ji bo diya min, xwîşka min û gişt xelkê aşkera û hesan bin. Min nevê ez dilê wan nexwes bikim, belku min divê bextiyari û kêfxweşiyê ji wan re bibim. Çinku heke zimanê min xera bû, hîngê ew çend jiyana min têk dide û dilê min diêşîne."(1) Belê; helbest ji pênuşa wî, mîna ava kaniya dizê, rêka xwe dişeqînin û xwe digehînin nav mejî û ruha xwendevanî. Ci di mejyê wî de heye dibêje û ci di torkê wî de heye, vala dike meydanê. Ew ji ci hêz, rijêm û deselatê natirse û bi wê çendê,

هەوانامەی کتیب

helwêsta mirovekê dilsoz û xemxor nîşan dide û bi wê rê xizmeta gelê kurd dike û wî ber bi bajarvaniyê dibe. Helbest ji cem Letîf Helmetî, wek av û nanî ye. Dema nenivîse, hîngê dimire. Lewra jî berhem û pirtûkên wî pirr in, lê bi hêz in, diserketîne û cihêن xwe di pirtûkxana kurdî de kirîne. Ez bawer dikim ku, pirraniya pirtûxanêن mala jî, bi pirtûkên wî dixemlandîne. Her edebdostek jî hebe, bêguman nav û dengê wî bihîstiye, çinku bi rewiştêن xwe yên paqij, helwêstêن xwe yên mirovane û welatparêziya xwe, şiyaye biçe nav dilê her kurdekê. Kemal Mîrawdelî vê rastiyê, pêtir aşkera dike û dibêje:" Letîf mirovekî paqij e, paqijiye ka bê sinor. Xwedan ruheka paqij e. Ji vê paqijiya wî, rastî, dilsozî û sozêن sofiyaneyêن wî dizêن. Lewre nabe yek Letîfî binase û xwes nevê. Ew kesekê xweştiviye."(2)

Mirov dikare bêje ku, çendîn sala, li pirraniya bajarêن Kurdistanê û li Bexdayê jî, eger fêstîvaleka şîirî hatiba gêran, bêgman diviyabû Letîf Helmetî, helbestêن xwe tê de xandibana. Çinku wî cihê xwe di dilê xwendevanî de kiribû. Ferhad Şakelî, li ser behre û hunermendiya wî dibêje:" Di nav helbestvanê iro yên Kurdistanê de, bawer nakim kesek bi qasî Letîf Helmetî, xwedan behreya şîirî be. Di destpêka salêن 1970 ê de, ew weke taviyeka barana buharê bari û bi dirêjiya çendîn sala, bibû diyardeka edebî di ferhenga kurdî de, rexnegir û rojnamevanê kurd jî, bi xwe û helbestêن xwe ve mijûl kiribûn." (3)

" Di sala 1970 ê de, bizaveka nû ya edebî, bi mebest û armanca peydakirina riyêن nû, wek guhrîna zimanê şîirî, bûçûnêن şîirî û teknîkên nû, ji dayik bû. Mebest ji wan riyêن nû ew bû ku, bikarin derbirrînê ji kovan, azar, xem û xewnêن mirovê kurd bikin."(4)belê; Letîf Helmet, yek ji pêşengêن vê bizavê bû û helbesta nû ya kurdî jî, gehande pileyêن bilindtir. Ji bo çespandina vê rastiyê jî, Refîq Sabir dibêje:" Dema basî nûkirina helbesta kurdî, di salêن 1970 ê de bête kirin, bi hizra min, divê berî her kesî, navê Letîf Helmetî bêt. Yekemîn komela helbestêن wî ku, di naverasta sala 1970 ê de belavbû, nîşana derketina dengekê nû yên helbestê bû û her wesa diyardeka nû bû di edebê kurdî de. Çinku bi zimanekê nû yên şîirî hate meydanê û bûçûnêن nû digel xwe anîbûn."(5)

Ji bo ku ew helbestvanekê navdar û jîr yên kurd e. Xwedan taqet û şîyanêن şîriyêن bilind e, lewre li cem xelkê xoştivî û bi rûmet e. li ser vê çendê jî, Hemeseîd Hesen dibêje:" Bi dirêjiya salêن heftê, netirstirîn, xoştivîtirîn û serkeftîtirîn helbestvanê kurd bû. Helbest keçek e zû xwe davêje himbêza wî, bi tenê awirekê lê bide, ci cihê bixwaze digel diçe. Gelek bi jîrî digel peyvê dilîze. Eger kurdan Şarîl Budlêrek hebe, ew Letîf Helmet e."(6)

Bi rastî jî, ew çûye nav dil û derûna xelkê. Ev çende bi hêsanî nabe. divê rewişt, jiyana wî ya rojane û helwêstêن wî yên mirovane, ew gehandibe vê encamê. Nexwe çewan edîbek dikare hin xoştivî be. li ser vê çendê, Ebdulrehman Zengene dibêje:" di her peyveka wî de, rastgoyî, dilsozî,

derûnpakî, kurdperwerî û welatparêzî serhildidin û bê perde û perjan, hest û bîrên xwe derdibire. Lewre bê pesindan, Letîf Helmet, pêşengê karwanê helbesta nû ya salên 1970 ê ye ku, piştî wî yên Riwançeyî jî, ew şop girtin û ew rîbaz meşandin.”(7)

Bi dirêjiya van 26 salên borî, gelek lêkolîn û gotarêne edebî, bi zimanê kurdî û biyanî, li ser helbestêne wî yên hatîne nivîsin, lê mixabin ku, li vê xerîbiyê destnakevin. Yusif Heyderî di lêkolîneka xwe de, bi zimanê erebî dinivîse:” Letîf Helmet, diyardeka şîirî ye û kaniyek e hişk nabe. Ew ji cîhaneka efrandinê pêkhatiye, cîhanek taybet û kûr. Ji bo ku mirov biçe nav vê cîhana rind û xweşik, pêdivî lêkolîneka berfireh û pirraliye.”(8)

Letîf Helmet, helbestvanek e bi doza gelê kurd û welatê xwe ve girêdayî ye. Nemaze texa hejar û bindest. Lewre jî, hêvînê pirrniya berhemên wî ku, çîrok û helbestan, ji bo zarok û mezinan dinivîse, li ser axîn, derd, xem, kovan, xewn û paşeroşa xelkê kurd û mirovatîyê pêk hatiye. Her çend carna li ser xemên xwe yên taybet û ruha xwe ya westiyayî jî divehîne, lê dîsan wan di nav xemên tevaya mirovan de, dihelîne. Ew nikare ji bin vê sîberê derkeve, çînku ew pirr bi mana peyvê mirov e... Ji bo serferazî û bextiyariya mirovan dijîtin. Nemaze mirovê kurd yê bindest, tepeser û ezyetdayî. Yê ku bi sedan sala ye, welatê wî wêran dibe û xwîna wî ya paqij dirijîte ser axa wî ya paqij. Belê; Letîf Helmet ji bo van dinivîse.

Hezaran sale, dijmin welatê wî wêran dike û ter û hişkî pêk ve dişewitîne. Ne bes vê, belku navê gund û bajaran diguherînin û şûnwarêne welatê wî jî diherrifînin. Ew mirov e û rîza wî ji bo miravatîyê heye, dixwaze gelê wî, mîna gişan jiyana xwe bi tenahî biborîne. Lê dijmin hemî riya li ber digirin û jîyanê lê dikine dozex. Lewre ew daxwaza mirovên bi bawer û netirs dike ku, beramber vê sitemê rawestin. Bi aşitî û biratîyê, mafê netewê wî nadin, belku bi xebat, qurbanî û xweragirtinê ew têne wergirtin. Ew di vê helbesta xwe de, tif li vê aşitiya direwîn dike.

Kanê Xalîlo? Li ber dergehê mezin  
Bê tîrs ji Mesîhî re bêje:  
Incîla xwe bişewitîne.  
Peyvîn xwe di bin derya windabûnê de, kilît bike  
Ey Pêxemberê aşitîyê  
Leşkerê kêvjaleñ hov divê  
Nexşê bajarê min biguherîne.  
Navên kolanan û dengê bajarê min biguherîne.  
Nav û nişanên bajarê min bidize.  
Min xoştivî xiste nav lepêñ xwe  
Kete ber rimêñ wan!  
Mirovatî kire lawkek ji bo wan  
Kotira bi niklê xwe birî, ew jî kuşt wan. (9)

Ew berdewam hewar û gazî dike. Lê kes bersiva wî nade!  
Êdî ji diruşmêm xapînokên mirovatîyê bêzar dibe. Bawerî bi

biratiya saxte û aşitiya direwîn namîne. Çinku ci hêzên xêrxazêñ dinê di hewara gelê wî naêñ! Ew di binê bîrê de ye û kesê hay jê nîne. Belê; ma çewan ev hemî karesat û boblatêñ vî netewê hejar û bêxwedî, nagehin herçar aliyêñ dinê?! Ma dibe, mirov di dînekê pîroz de, bira û hevbîr be û paşî bi navê Xudê û wî ayînî, mirovê kurd bikujin û fetwayêñ qirrkirin û kafiriyê ji bo derxînin û encam bidin.! Ma çira mirovatî çarekê ji vî gelî re nabîne? Erê; dema hemî dergeh bêne girtin û ci alîkarî jî nebe, hîngê mirovê kurd neçar dibe ku, bi çavekî din temasayî van diruşmêñ direwîn bike û li tolê bigere. Dema hêviyêñ wî didizin û jiyna gelê wî serûbin dîkin û girrnijînê li ser lîvîn zaroka dikujin. Êdî ew li riyêñ din digere û divê xwe biparêze. Lewre ew di vê helbesta xwe de, bi vî rengî digel dinê dipeyive.

Kê ev stirane ji bo min vegêra!?  
Kê hetava xweziyêñ min, havête gewriya şêra!?  
Pankart hemî direw in.  
Civata Gelêñ Yekgirtî û serbestiya mirovî direw in.  
Yasa... Wekhevî... Biratî...  
Roşenbirî... xwepêşandan... Aşitî...  
Hemî pirupagende ne û direw in.  
Dê vêca ey barûta tole û rastiyê  
Di bahoza paytextê ronahiyeka nû de.  
Tevan bipirtikîne,  
Di wê xwestiviya têt û naêt de. (10)

Ew dixwaze xelkê kurd hişyar bike û ji wê sitem û ezyetê qurtal bike. Rê nişanî wan dide û pîlan û nexşêñ dijminî aşkera dike. Digel hindê jî, helwêsta kesekê şoresger werdigire û naxaze bibe lêbokê dîwanê axa û began û berevaniyê ji berjewendiyê wan yên genî bike. Lewre dema ew digel xelkê dipeyive, hîngê forma qisekirina Mesîhî bikar tîne û dibêje: " Ez ji we re dibêjim..." Lê pirr caran ew xwe mîna Mesîhekê kurd dibîne, xaça xwe bilind dike û dixaze gelê kurd yê bindest û perîşan, ji dest û pencêñ Hecacêñ çerxê bîstê rizgar bike. Lê ew metodêñ Mesîhî yên mirovane û şîretêñ wî pêşkêş nake. Belku bi metodêñ vî serdemê kujtin û vebirandinê, serdemê nemana aşitî û biratiyê dixebite û xelkê kurd pal dide şoreş û serhildanê.

Min nevê mîna parseka bikim û  
Stirana ji bo axayî bêjim.  
Da min nekuje, da bihêle di koçka wî de bipeyivim.  
Ez ji we re dibêjim: Pirr rengî, mikyac e.  
Ez ji we re dibêjim: Biazirin...  
Li dij nexşe û bacê.  
Yaxî bibin ji meydan û geracê.  
Mirov mîna amîreta dikeve herracê.  
Yaxî bibin ji satûra sor bûyî bi xwîna Helaci.  
Yaxî bibin ... Yaxî bibin  
Ji Xudayê vî bajarî, ji Hecaci. (11)

\*Helac: Sofiyekê bi nav û deng bû li Bexdayê. Di dema Ebasiyan de, ji ber bîr û bawerên xwe, pirr bi kirêtî û namerdî kuştin. Dest û pên wî bîrrîn û bi darê ve helawîstin, paşî sotin û xweliya wî havêtine nav çemê Dicleyî, ji bo ku wî ci gor nebin û rojekê nebe cihê seredan û tewafa mirîdên wî.

\*Hecac: Hakim û hovekê serdema Emewiya bû li Kofe, Îraqê. Sitemeka mezin li ser musilmanên ne li gor baweriyêne wî û bêgunehan dikir.

Ew di gelek helbestên xwe de, hewarên xwe digehîne Xudê û Pêxemberê wî. xemên gelê kurd dike gelwaze û bi stûyê xwe yê zirav ve dike û ber bi dîwana Xudê diçe. Belê; ew ji bo rizgarkirina kurdan, hemî riya dişeqîne. Lê herdem dest vala û bê hêvî, vedigere welatê xwe yê wêran kirî! Ew pirr bi gewriya xwe hewar dike û serinca cîhanê radikêse rewşa kembaxa gelê kurd. Ew li kesekî bi hêz û xwedan şıyanêne mezin digere ku, derkeve û vê sitemê nehêle. Ew li benda Mihemedekê ye ku vî gelî bigehîne kenarê tenahî û xweşiyê. Ew li benda hêza Ebabîlekê ye ku, bêt û leşkerê dijminan bide ber kevirên Sicîl. Zîndan û girtîgehan biherrifîne û milê kurdan ji ber satûra dijminan qurtal bike. Ew hewara xwe digehîne Pêxemberî û jê re xuya dike ku, çend car Kurdistan wêran kirîne, mizgeft û heta Qurana pîroza wî jî şewitandîne... Ew wê rewşê û azarên gelê kurd, bi eşkerayî di vê helbesta xwe de, destnîşan dike. Werin em bi hev re bixwînîn.

Min xoştivî nivîsi li ser keştiya xwe.  
Nav û nîşan hêlan li ser gora xwe.  
Ez im. Ez im  
Di ferhenga hemî ziman de, win im.  
Taziyê ji bo yekem rojê dikim.  
Ez digerim, li tevaya şkefta digerim.  
Ger Mihemedî bibînim, dê jê re bêjim:  
Çira Zulfeqar te xistiye destê dijminen Emar?  
Dê jê pirsim: Çira dubare Ebabil  
Leşkerê Ebrehey nadene ber kevirên Sicîl?  
Dê jê pirsim: Tu ci ji zîndna dizanî?  
Bastîl. Bastîl.  
Hezareha Nuqreselman.  
Dê jê pirsim: Derbareyî sedan tawan.  
Dê jê pirsim: Tu dizanî. Tu dizanî.  
Çend car şewitandin kurdistan!  
Şewitandin, çend mizgeft û çend hezar Quran! (12)

\* Di soreta Elfîl ya Qurana pîroz de heye ku, Xudê tewalên Ebabil hinartine ser leşkerê Ebreheyî û şkand.

\* Emar kurê Yasirî: Hevalekî Pêxemberî bû. Dijminen musilmanan li ber çavên wî dayik û babê wî kuştin.

\*Ebabil: Teyr bûn û her yekê sê ber li kafiran direşandin û hemî paş de birin.

\* Sicîl: Ber bûn yan jî heriya hiskkirî bû.

\* Ebrehe: Melikê Yemenê bû.

\* Nuqreselman: Zîndaneka bi nav û deng bû li biyabana jêrî Îraqê.

Ew bi hemî bawerî û bûçûnên xwe ve, girêdayî texa bindest û hejare. Ew ne bes guh dide pirtûk û teoriyan, belku di piratîkê de jî, digel tepeser û rûtê welatê xwe ye. Ew baş agehdarî kawdanêñ hejara ye, çinku di jorêñ hotêlêñ here erzan de, bi tenê jiyaye û derdê feqîriyî û dûriyê kêşaye û dîtiye. Ew bihayê nanî dizane û dehan cara li kolanêñ xerîbiyê birçî û bê xwedî maye. Lê bi rastî helbestvanekê cergasin e û tirsê rê li ber xweragirtin û xebata wî negirtiye. Ji lewre jî pirr xoştiviye.

Ew mirovek rastgoye û xelkê naxapîne, anku ne her bi peyvê, belku bi karî jî, vê çendê nîşan dide. Werin em vê helbesta wî bixwînîn, da ku bizanin ku heta çi pileyê digel xelkê xwe yê hejar daye û besdarî xem, derd û xoşiyêñ wan dibe.

Hejarîno...

Ger we hest kir, dengê min yê we nîne.  
Rengê min, yê we nîne.  
Ger we hest kir, xema min ya we nîne.  
Devê min yê we nîne.  
Helbestêñ min bidirrinin.  
Mîna peykerekê kirêt, min biherrifînin.  
Ger we hest kir, mîna we ne birçî me.  
Ger we hest kir, li derveyî zinca we dijî me.  
Ger we hest kir, burjuwazi me.  
Navê min, mîna jenga pareyî birrenin  
Ger we hest kir, mîna we zehmetkêş nînim.  
Mîna hewe kaniya xem, jan û êşa nînim.  
Ger we hest kir  
Min di dilê xwe de bikujin  
Bi hevokeka mezin binivîsin  
Şairekê tirsinok û direwîn mir... (13)

Welat di nav xwîna wî de ye. Ew di eşqa wî de helyaye. Mezinan gotiye:" Şam şekir e, lê welat şirîntir e." Ji xwe eger welat ewqas xweşik, rind û dilveker nebe, kes nikare qurbaniy ji bo bide. Mirovê bê welat, berze ye û çi bihayê xwe nîne. Heta niha bi sedan hezara, ji xort û kalêñ me, ji keç û dayikêñ me, di riya welatê dagîrkirî de, şehîd bûne û bi xwîna xwe ya paqij, dara azadiyê avdane. Helbestvan bi giyan û bîrêñ xwe ve, girêdayî doza welatê xwe ye. Xebat ji bo kiriye û çendîn cara jî, li ser hindê, toşî ezyet, gîriftarî û derdeseriya bûye. Ew ji bo welat û gelê kurd bûye helbestvan û dinivîse, rûpelêñ dîwanêñ wî jî, bi xem, kovan û derdêñ welatî dixemlandîne.

Dema hatin, hizir kirin  
Welatê min, pîrekaka rût e û dikarin bikirrin!  
Digel xwe bibine avdestxanê.

هەوالنامەی کتىپ

Digel xwe bibin qehpexanê.  
 Hizir kirin, welatê min bi peran e.  
 Pîrekeka rût û ciwan e.  
 Sêt û şeyda ye ji bo gustîl û memikdanê.  
 Dê xapînin, dema du toqe û çend şeh danê.  
 Lê nizanin, welatê min, Ke'be ye  
 Bi hezaran nobedar yê li rex û çanê. (14)

Mirov helwêst e, lê dema di riya serferazî û serbilindiyê de be. Divê helwêsta mirovî, beramber doza adil û jiyana rojane, paqij û rasteqîne be. Ji xwe kesê bê helwêst, di nav civatê de, bê biha ye. Bi taybet di nav rêzên gelê me de, helwêst mîna nan û avê pêwîst e. Çinku welatê me dagîrkiriye û em jî bindestîn. Ji bo bi cêanîna armancêن pîroz, divê xebat bête kirin û xweragirtin jî pê re be. Nemaze di nav texa hişyar, bispor û zana de, çinku ew tex ji hemî çînêñ din, pêtir di rewşê digehe û dikare giriftariya şirove bike, pîlan û nexşîn giring ji bo rizgarkirinê darêje. Helbet dema gelî, pêwîstî bi helwêstêñ şoreşgêrane hebe, hîngê kesên çeleng û tirsinok jî, xuya dibin. Di nav şoreşê de û di qonaxa rizgariya gelan de, bi sedan nivîskar û ronakbîr şehîd bûne û doza gelê xwe ber bi pêş de birîne. Helbet di nav rêzên tevaya serhildan û şoreşêñ kurdi de jî, bi dehan kesên zana, nivîskar û jîr, xwe gorî axa pîroz kirîne. Lê li aliyê din jî, bi sedan kesên tirsinok û xweperêş jî hene ku, çi helwêstêñ şoreşgerane wernagirin û belku roleka pîs û nebaş dibînin. Hîngê bêguman dîroka gelan, rûpelêñ reş ji bo tirsinok û yarêngavê dinivise û yên geş û zêrîn jî, ji bo welatparêz û şoreşgeran dixemline. Letîf Helmet, helbestvanekê xwedan helwêstêñ şoreşgêrane û bilind e û welatparêzekî jêhatiye. Berhemên wî, vê rastiyê destnîşan dikan. Werin em vê helbesta wî bixwînîn.

Şairokêñ tirsinok  
 Ey zelamêñ bê nav û lêbok  
 Hûnin. Hûnin  
 We helbest kirine nala hespê sultanî.  
 We da bi av, bi nanî.  
 We da bi maç, bi navranî.  
 Ey zelamêñ piç...  
 Kê gote we, helbestê pêşkêş bikine  
 Şah û Xelîfêñ xesandî?  
 Erê Şa pîroze yan pêlavâ hejarî ya dirrandî?  
 Ew dehola hûn lê dixin, wê kun bibe.  
 Wê rojek bê, koçk û kela hemî Şaha, kavil bibe.  
 Evca hîngê, kî dê ji bo helbestêñ we bikir bibe.  
 Ey zelamêñ bêrûmet û genî.  
 Ey şairêñ mîna solê, her li binî. (15)

Dijminan welat dagîrkiriñe û parce kirîne. Bi vê çendê sinor di navbera dever û gundêñ Kurdistanê de çêkirîne. Rûbarek, çiyayek û carna baxçeyek, bûye du bes û her yek di bin kontrola dewletekê de maye. Bi vê pîlan û hovîtiyê, xelkê me ji hev dûr bûne. Dayik ji keçê, bab ji kurî û

pismam ji dotmamê. Belê; nimonên vê rastiyê gelek in. Pirr caran li gundekê kurda yê sinor kirî, li wî alî keç bank dike û li vî alî dayik diqêrîne, pirsa kawdanêni jiyana xwe dikan. Eve derdekê mezin e û dilê xelkê me dihelîne. Em di nav welatê xwe de, mîvanîn û ji bo dîtina hev, divê paseporten me hebin! Dijmin riyêni dîtinê jî, li me digirin. Letîf Helmet, di vê helbesta xwe ya bi navê (Amoza giyan)de, gelek zîrekane, çûye nav derûna pismam û dotmameke kurd ku, ji hev dûrin û nikarin bi dîtina hev şâ bibin. Xuyaye ku pismam pêşmerge ye û dotmam jî li bajarî ye. Dijmin rê nadîn û ew jî nikarin bi hêsanî hev bibînin. Stiraneka xwes peyv û xwes awaz bi vî navî, di folklorâ kurdî de heye û di nav xelkê de, pirr belav e. Lê wî zîrekane kariye sodê jê wergire. Ew biha û giringiyê dide folklorâ kurdî û di nav wê deryayê de, digere û dirr û mirariya jê dertîne. Ew dibêjê:" Helbesta folkloriya kurdî, cîhaneka pirr e ji nûkirinê. Bi baweriya min, her helbestvanekê kurd, eger bi sedan têkistêni helbesten folklorî, lawik û heyranan nexwîne, ew nikare bibe şairekê resen û nikare rîbaza xwe ya taybet peyda bike." (16)

Ev helbesteka pirr kûr û ji aliyê form û naverokê ve, serketî û lihevhatiye. Musîka wê jî, dilê xwendevanî xwes dike. Werin da em bi hev re bixwînîn.

Tu dûrî û rî jî dûr e dotmamê.

Hezareha çetêni birçî,

Di navbera me de, sinore dotmamê.

Eger destê min negehe te

Eger mêtina maça min negehe te

Eger çûka helbesta min, negehe te

Li min bibore...

Rî dûr e dotmamê...

Eger devê xwe dirêjî yê te bikim, dê qetînin.

Eger tiliya xwe dirêjî porê te bikim,

Dê şewitînin.

Eger nama şairekê dûre bajar

Bigehe nav sinorêni bajarî

Ne bes namê, belku posteçî jî dihincinînin...

Ez têhniyê te me, ya biyaban yê avê ye, dotmamê.

Ez şeydayê te me, ya bajar yê hetavê ye, dotmamê.

Ez di xew de tê me cem te

Bêy ku te hişyar bikim

Herdu lamêni te diramosim

Asoya devê te, tijî helbest û stiran dikim.

Digel elindê peyva nameka bê nav

Li memkêni te diresînim, mîna gulav.

Dibe evîn jî bi dawî bê, wek baranê.

Dibe evîn jî bimire, mîna gula nîsanî

Ne, ne ci car evîna me, namire dotmamê.

Evîna me, befr nîne bihele, dotmamê

Tevaya peyvên xweşikêن ferhenga  
Dê têkelkim dotmamê  
Dê stiranekê pê nivîsim...  
Dê rojekê ji bo te xwînim... (17)

Dijminî hemî dergehêن bajarvaniyê li ber gelê kurd girtine. Ne rê didin xelkê me zimanê xwe biparêze û ne jî fêr bibin. Belku dixazin gelê me di nav xwe de bihelînin û dîroka me jî binax bikin. Belê; dijmin ji ziman û zanînê ditirsin û hezaran nobedar û kirêgirteya li pey peyva kurdî rêz dikan. Li Tirkîyeyê sizayî jî didine wî kesê bi peyva kurdî biaxêve! Ew dizanin hêza peyvê çende û rola wê çend giring e. Lewre li hinedek deverên Kurdistanê zimanê kurdî qedexe ye, lê li cihêن ku serbest bûye, ew bi xwîna hezaran şehîda geşbûye û piştâ dijminan çemandiye. Eger bikarin û rê bibînin, wê li tevaya welatî qedexekin. Werin da ku van peyvên wî yên agirîn bixwînin.

Dema şairek temaşayî kaxezekê dike  
Tevaya dijminî wî cihî dûrpêç dike.  
Li bin gişt kevir û dara  
Xwe diveşérin weke mara  
Dibe ji hindê bitirsin.  
Şairê hejar tevaya peyva,  
Li wan bike dijmin.  
Dibe ji hindê bitirsin. (18)

Gelê kurd ji neçarî dest daye tivengê û şerê rizgariyê dike. Çinku hemû rê lê girtine û ji bo ku xwe ji vebirandinê biparêze, ew toşî şerî bûye. Her wesa ji her alî dijminan dûrpêç kiriye û bêhna wî çik kiriye. Welat wêrankirînê, mirov bi saxî veşartîne, zik li jinêñ aviz peqandîne, gundiyêñ hejar di şkefta ve şewitandîne û gel bi giştî dane ber hêrişa çekêñ kîmyawî û qirrkirinê. Belê; dema ev hemî tadaye û ezyete hebe û mirovatî û wîcdan jî nemîne, hîngê ev gelê tepeser, hewara xwe bigehîne kê? Ew ji berevaniyê zêdetir, ci riya nabîne û ji lewre bi xebateka gerim û bê rawestan, hebûna xwe diparêze. Ew xuya dike ku aşitî û biratî bi çekî peyda dibe. Ji îsa pêxember re dibêje: "Ev e ne demê diruşmên te ye. Here ji dîrokê derkeve. Yê me bikuje, divê tola xwe vekîn. Yê didanekê me bişkêne, em dê serê wî herrişînîn!"

Ji hezretî îsa re bêjin:  
Ger birîna zarokê vî bajarî bibîni.  
Çewa dipêçe û dibore, bê kerb û kînî.  
Hêsta cihê bizmarê zordaran  
Di lepî de diyare.  
Lew hewar e.  
Ji hezretî îsa re bêjin:  
Ger bizanî zordarêñ vî çerxî.  
Çewa zarokan dikujin, mîna mês, kuli û berxî.  
Dê Incîlê şewitînî,  
Hewarkî û êye vî rexî.  
Yê zilehekê li te xîne

Dê deye ber şêlka gulla û tolê derxî... (19)

Karesat û boblatên mezin hatîne serê gelê kurd û heta niha jî, bi sedan xelkê me bi destên dijminan têne kuştin. Welat dişewite û her çi karêن hov hene, beramber me têne kirin. Gelê ji bo rizgar kirina nîştimanê xwe xebatê bike, bêguman wê şehîdan jî bide. Her çend hîzrên cuda û şerenixa texeyî, di nav tevaya gelên dinê de hebûne û niha jî hene, lê mixabin ku, di nav gelê kurd de, ev nakokî û giriftarî, mezin bûne û şerê birakujiyê birînên kûr di dilê xelkê me de çê kirîne. Her çend serokên kurda û hêzên siyasî jî, dizanin ku ev şere, xizmetê nake û ziyanêن mezin digehîne doza pîroza kurdî, lê hezar heyf û mixabin ku, dest jê bernadin û bi riyêن biratî û aşitiyê, giriftariyên xwe çareser nakin. Belê; vî şerî dilê xelkê me heland û omêdên paşerojê jî binax kirin. Ev şere bo sedemê peydabûna xem, azar û birînên kûr. Di vî demî de ku, dijmin bi pîlan û nexşên xwe yêن kirêt û çepel, rê li serketina gelê kurd digirin, li vî al, hêzên kurdî bi xwe jî, dibine kosp û asteng di riya serferazî û serbilindiya xelkê me de. Eger mirov bi hezaran rûpelan binivîse, hêsta nikare rewşa kembaxa vî şerê birakujiyê salox bide. Ev e şerê wêrankirin û şewitandina Kurdistanê ye. Şerê paşveman û binketina gelê kurde. Şerek e ku serketin tê de nîne. Şerek e ku doza kurdî çendîn sala paş ve dibe û li tariyê dihelîne. Şerek e ku divê her welatparêzekê kurd li dij be û li riyêن çareserkirinê bigere. Belê; bi dehan nivîskar, ronakbîr, zana, bispor û dostên gelê kurd jî, li dij dinivîsin û hêstan ne rawestaye. Letîf Helmet, bi ruheka kurdekê paqij, xemxor û welatparêzekê hisyar, vê helbesta dilşewat divehîne. Rewşa gelê kurd û encamên vî şerî destnîşan dike. Ez helbesta wî ya bi navê( Nameyeka vekirî di pêşwaziya sala 1996 ) ê de, şirove nakim, çinku peyv bi xwe hewar dîkin û laneta li vî şerê xwekuştinê dîkin.

Ev e rojeka nû li ser kopê Gilezerdî  
Hêlinkekê ava dike ji xwe re.

Bi xêr hatî ey sala nû  
Me çi nîne pêşkêş bikîn ji te re.  
Ji bili rondik û xewnan.  
Ev e derbeder li benda te ne dîsan.  
Tu wan dinasî?  
" Derbeder ji dûr ve diyar in  
Rût in... Birçî ne... Xembar in."

Bi xêr hatî ey sala nû  
Çi di torkê te de ye, te çi anî?  
Gulegnim û aşitî, gulenêrgiz û biranî.  
Yan jî kelex, xwîn û malwêranî?  
Ey sala nû  
Tu mîna sala bûrî neke  
Sala bûrî dilreq bû.  
Tewalêن ser cadan koçber kirin û her rev bû.  
Kotira gîrrnjîn û aşitiyê, nêcîra çifta bû.

Kurdistan.

Kire Mergistan.

Em hemî ji bo pêşwaziya te hatîn û me hêviye.

Her çend em destvala ne, lê dilê me pirr xwestiviye.

Me gul divên, neku gulle.

Me nan divê, neku rondik.

Me kar divê, neku sitem û hutik.

Me gîrrnjîn divê, neku peyvîn rengîn.

Me aşitî divê, neku şerê birakujiyê û xwîn.

Tîrsinok in yên beşdarî şerê birakujiyê dibin...

Qareman in yên aşitiya navxwe dirust dîkin...! (20)

Ew pirr bi rewşa aloz û dilşewata gelê kurd diêşe. Nemaze dema dibîne parçekirî û ji hevketî. Dijmin cudayıya dixine nav rêzên kurda û pîlanê çepel dadinê. Dibîne ku rijêmên dagîrkerên Kurdistanê, bi tevayî xwe ji bo nehêlana gelê kurd, dikine yekdest. Bi dirêjiya çendîn sala îraq û ûran şerekê wêrankirinê digel hev dîkin û herdu welat diêne şewitandin û bi milyonan xelkê wan ji diêne kuştin, girifrariyên wan dîrokî ne û dijminatiya wan ya berî sedan sala ye ji, lê bibînin... Ay Xudêwo! Dema rewşa kurda baş dibe û xwe nêzîkî rizgarkirinê dîkin, tevaya dijminên hev yên duhî, dibine dostên sitratîci û li dijî netewê kurd şerî dîkin û pîlanê qirrkirinê dadirêjin. Ev e di navbera herçar rijêmên hov de, ku hemû dijminên hevin û li dij kurda dibine dost û bira!. Eve hemî ji aliyekê, lê li aliyê din karesata herî mezin dest pê dîkin!. Xelkê me nabine yek û her ji hev cuda ne! Giriftariyên xwe yên berwext nakine di xizmeta doza pîroza kurdî de. Mixabin ku heta niha ji nikarîne bi yekdil û yekdest li dijî dijminên xwe xebatê pêş de bibin! Her hêzek bi tenê be, hîngê dijmin dikare bi hêsanî ji nav bibe û bixapîne ji. Lî eger hemî xwe bikin yek, hîngê şkestina wan zehmet e û serkeftin nêzik dibe. Letîf Helmet, pirr bi vê giriftariyê ve mijûle û rewş dilê wî dixwe. Lewre ew ji dil li dij hevqetandina gelê kurde û daxaza yekgirtinê dike. Belê; yekgirtin serketin e. Yekgirtin azadî û rizgariyê tîne. Ew di helbesteke xwe de, bi vî rengê jêr, yekgirtinê destnîşan dike.

Tevaya peyvan civiyan

Bûne dirêjtirîn helbest û stiran.

Tevaya şemalkan civiyan

Bûne hetaveka geş û rûn.

Tevaya ava yekgirtin

Bûne mezintirîn lihî û avrabûn.

Bûne darek... Tevaya darêñ daristanê.

Bi hêztirîn bivir şkand li meydanê.! (21)

Jin di gelek helbestên wî de, cihek giring distîne. Ew di çendîn helbestên xwe de, wesan dide xuya kirin ku, çi keçik xwe nahavêne himbêza wî. Dibe ji lawazî, feqîrî û hejariya wî be. Ew xwe bêşîyan û bêhêz beramber jinê û ciwaniya wê dibîne. Eger we nebe, pa çira keçik wî nakine

kilê çavêن xwe û nakin ristikêن rengîn, bejin û stûyêن xwe pê naxemlînin!. Çira li govendan destêن wî naşidînin û li sererêkan jî, awirêن evîniyê lê nareşînin!?. Ew riyeka din ji bo himbêzkirinê dibîne û car xwe dike mîvanê xewnêن wan û carna jî, keçikêن şeng û xweşik, radikêşe cîhana xewnêن hingivîniyêن xwe. Ew nikarin xwe ji xewnêن wî rizgar bikin.

Ger di xewê de şairek hat  
Viya te himbêz bike.  
Viya bi zûrê te maçî bike.  
Ger di xew de şairek hat  
Viya te birevîne, bibe ji xwe re.  
Ew ez im...  
Bes di xew de dikarim rûnim bi te re. (22)

Ew xwedan hesteke nazik û dêrûneke paqij e. Ew bi wê bejna xwe ya kinik û porê xwe yê qijavij, lê bi cergê şêra û bi dilekê mezin û pirr evîndarî û dilovanî, herdu destêن xwe ji bo keçekê vedike. Ew bi dirêiya şevan û rojêن bêkariyê, li benda keçen rind û xweşik dimîne, lê kes di tan û hewarê naêtin! Belê; ew di vê cîhana berfireh de, xwe bi tenê dibîne. Hinde caran bi xerîbiya xwe digehe pileya namobûnê.

Ax dema carna di jora xwe ya wek qefesê de  
Ez xwe divenisînim û digivêşme serêk  
Ez hez dikim  
Dilê xwe mîna parçeka goştê gehî.  
Bavême ber pisîka birçiya pişt dergehî.  
Bila êdî stirana nelûrîne bo keçekê.  
Ku di dili de nabe cihê şairekê ...! (23)

Lê jin, ne her bokeşûseye û ji bo ciwanî û rindiyê peyda bûye. Belku; ew jî mirov e. Xwîşka hêja ye, dosta xebatê ye û dayika dilovan e. Lewre jin, dayika Letîf Helmetî, pirr aliyêن jiyana wî dagîr dike, nemaze dema li pêş çavêن wî dişewite û nikare rizgar bike. Ew birîn kûr e û naête ji bîr kirin. Ew evîndarê diya xwe ye û ji lewre jî pirr rêz û bihayî dide jinê bi giştî. Ji aliyê din ve, dayik jî hemî hêza xwe dide zarokan û xwe dişewitîne da ku ronahiyê bide wan. Çinku Letîfi baweryeka mezin bi musilmanetiyê heye û ayîn jî, roleke giring dide dayê, nemaze dema Mihemed pêxember bi xwe, pesnê dayikê dide û dibêje: "Dayik sê pile û derecan li pêş babêye." Ji lewre ew di çendîn helbestêن xwe de, basî xweşikî, nazikî, dilfirehî, dilovanî û hêjayiya dayika xwe dike. Ew axîn û nalînêن kûr ji bo diya xwe radihêle. Werin em vê helbesta wî ya dilşewat bi navê (Mezintirîn Birîn)bixwînîn.

Dema diya min mir.  
Ne stêr ji esmanî rijyan,  
Ne masiya koç kir!  
Dema diya min mir.

Ne rondikek ji çavê esmanî der bû!  
Ne tewalek di xemê wer bû!  
Dema diya min mir.  
Erd her wek xwe bû  
Lê di nav dilê min de  
Dergehê kûrtirîn birînê vebû.  
Ay yadê, dûriya te pirr giran e.  
Dûriya te, ne qirraqiçîna têhnê ye  
Ne zîzbûn û dilmayîna dezgirtiyê ye  
Ay dayê  
Dibême şekroka, şekrok  
Dibême birînê, birîn  
Dibême gulê jî, gul  
Lêbelê dayê  
Êdî heta hetayê.  
Bêjime kê dayê...? (24)

Ew di gelek helbestên xwe de, naverokê dubare dike û formê jî lawaz û sist dike. Hinde caran mîna suhbeteke sade dinivîse û çi tam û çêja helbestê namîne, wek :

Berî çend saleka  
Ez û çend hevalên xwe  
Li ber dergehê tecnîda bajarı  
Çaverêy hindê bûyn  
Ku me bo serbaziyê bibin. (25)

Letîf Helmet, bêguman helbestvanekê bi nav û deng e û xwedan behre(mewhîbe), taqet û şıyanêñ edebiyêñ bilind e. Berhemên wî ji aliyê form û naverokê ve di serketîne. Teknîka nû bikar tîne û jîrane bi peyvê dilize, bê ku mebesta xwe berze bike. Di nav xelkê de jî pirr xoştivî û hêjaye. Bi zimanekê şîiriyê resen, sivik û rewan dinivîse. Helbestên wî ji wênen şîirî mişt in û hevokên wî jî ciwan darêjtîn e, musîka wan mirovî dihejin in. Ew zû mebestên xwe digehîne xwendevanî û dilê wî xweş dike û tesîrê li ser dihêle. Şairê ereb Ebdulwehab El Beyatî, di helbesteka xwe de, dinivîse:  
Mîhracay gote Xalibî  
Te çi di gustîla xwe de, veşartiye:  
Dilopeka jehrê  
Laneta evînê  
Yan jî zeriyeka xweşik  
Bi xemgîni lê vegêra:  
Helbestên xwe û xemên hejaran. (26)

Belê; di gustîla Helmetî de jî, bi tenê helbest, xem û kovanêñ hejaran hene, ne ku jehir û pîlanêñ genî û saxte. Ew ji bo texa bindest û tepeseran dinivîse û xwe li ber tevaya lihî û nexweşîyan jî radigire, ta ku doza wan ber bi pêş de bibe û keştiya xwe bigehîne kenarê tenahî û serferaziyê.  
( Letîf Helmet, di sala 1947 ê de, li bajarê Kifrî, ser bi parêzgeha Kerkûkê, ji dayik bûye. Di sala 1963 ê de, dest

bi nivîsîna helbestan kiriye û di rojname û kovarêن kurdî de belav kirîne.) (27) Helbestêن wî yên hatîne wergerandinî çendîn zimanêن biyanî. Ev helbestêن min di vê lêkolînê de, bikar anîn, ji dîwanêن wî, tîpêن erebî û ji kurmanciya jêri (sorani) wergerandîne kurmanciya jori. Mebesta min ew e ku, berhem û cîhana hunermendiya wî, bigehînime tevaya kurdêن parçêن Kurdistana dagîrkirî. Hêvîdar im pirtûkxana kurmancî bi vî pirtûkê dewlemend bibe.

Heta niha wî ev pirtûkên jêri çap kirîne:

1. Xiwa û şare biçkolekeman. Helbest 1970.
2. Amadebûn bo le dayikbûnêkitir. Helbest 1973.
3. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Helbest 1977.
4. Gerdelûlî spî. Helbest 1978.
5. Ciwantirîn dê. Helbest ji bo zarokan.
6. Ew namaney ke daykim nayanxwênitewe. Helbest 1979.
7. Ew honraweyey ke tewaw debê û tewaw nabê. Helbest 1979.
8. Wişey ciwan gule gul. Helbest.
9. Deng xoştirîn mel. Helbest ji bo zarokan.
10. Felestîn hemîşe nîştimanî Xesan Kenefanî ye. Helbest.
11. Sirudî hejaran. Helbest 1983.
12. Hêlaneyêkitir. Helbest û çîrok ji bo zarokan, 1989.
13. Em rûbare wişk nakat. Helbest 1991.

#### ÇAVKANÎ

1. Bedel Revo Mizûrî. Sînahiyêن çiyayî, Bexda 1989, rûp 7.
2. Kemal Mîrawdelî. Rojnama Hetaw, hejmar 4 û 5, Lenden 1996, rûp 4.
3. Ferhad Şakeli. Di nameka xwe de, ku ji bo min hinartiye.
4. Xelîl Duhokî. Kovara Nûdem, hejmar 18, rûp 66.
5. Refîq Sabir. Di nameka xwe de, ku ji bo min hinartiye.
6. Hemeseîd Hesen. Goraniye balnekirawekan, Swêd 1994, rûp 135.
7. Ebdulrehman Zengene. Di nameka xwe de, ku ji bo min hinartiye.
8. Yusif Heyderî. Rûpelên rengîn ji edebê kurdî, Bexda 1991, rûp 118.
9. Amadebûn bo le dayikbûnêkitir..Dîwanahelbestan, Silêmanî 1973, rûp 7.
10. Her ew çavkanî, rûp 14.
11. Her ew çavkanî, rûp 18.
12. Her ew çavkanî, rûp 26- 27.
13. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Dîwana helbestan, Silêmanî 1977, rûp 30.
14. Her ew çavkanî, rûp 81.
15. Her ew çavkanî, rûp 99.

16. Kovara Xermane, hejmar 9 û 10, Swêd 1993, rûp 17 - 18.
17. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e.rûp139-140, 142-143, 145.
18. Em rûbare wişk nakat. Dîwana helbestan, Bexda 1991, rûp 9.
19. Her ew çavkanî, rûp 30 - 31.
20. Kovara Dengê Melbendî, hejmar 1, Emerîka 1996, rûp 29 - 30.
21. Sirudî hejaran. Dîwana helbestan, Bexda 1983, rûp 35.
22. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e, rûp 6.
23. Ew honraweyey ke tewaw debê û tewaw nabê. Dîwana helbestan, Bexda 1979, rûp 9.
24. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e, rûp 22 - 23.
25. Ew honraweyey ke tewaw debê û tewaw nabê, rûp 87.
26. Kovara El Hewadis ya erebî, hejmar 2051, sal 1996, rûp 54.
27. Kemal Mîrawdelî. Rojnama Hetaw, hejmar 4 û 5 , Lenden 1996, rûp 4.

## هەوالنامەی کتىب

AMADEBÛN BO  
JI DAYIKBÛNEKA DIN  
( Dîwana helbestan, Silêmanî 1973 )

STIRANA DAWIYÊ

هەوانامەی کتىب

Birînên xwe ji koran re  
Ji rîwiyan re  
Bikine pir.  
Bikine gola xwîna rîyêñ sinorê bajarî.  
Peyvêñ xwe bikine av, bikin rûbar.  
Ji bo jiyê erdê xembar.  
Dibe rihêñ mukumêñ mirinê!  
Ji erdî derbînî  
Ji bişkoja azarê.  
Pê bikene gula buharê. (rûp 14-15)

#### BIRUSKEKA NIHÊNÎ

Bajarê min yekem şanoya tawanê ye.  
Yasa di destê cerdeyî de ye.  
Pêxember girtiyê zîndanê ye.  
Helac di nav xwînê de xeniqiye.  
Ebû Leheb xwedanê Încîl û Quranê ye.

هەوالنامەی کتىب

Di vî bajarî de. Di vî bajarî de.  
Di distarê xeman de.  
Gişt evîndar.  
Gişt hestiyar.  
Sahir û fêlbazek dihêre.  
Em hêşta rûyê xwe mikyac dikîn.  
Em hêşta evîniyê herrac dikîn.  
Em hêşta ji bo teliseke xurma negehiştî  
Baweriyê bi Decalî tînîn.  
Em hêşta qesra axayî bi heriyê boyax dikîn.  
Postalên wan boyax dikîn.  
Qisêñ xwes bo wan dikîn.  
Em hêşta di qehwexane û baran de  
Li ber dengê Ehlam Wehbî û Esmehanê,  
Mîna mirîşka kurk dibîn.  
Hêşta me pêxweşe bi Dînarekê  
Sed Qedemxêra, li ser nivînên Paşayê Kor tazî bikîn.  
Em hêşta hezareha Nexeda  
Dê li ser misteka zêrî, herrac kîn.  
Em hêşta li ser şanoya derbederiyê artêstîn  
Bê zimanîn.  
Heta niha. Heta niha rola xwe nizanîn!. (rûp 19 -20)

DENGÊ YEKE

هەوالنامەی کتىپ

Ger min bikarîba. Ger min bikarîba  
Bajarê xwe diherrifand.  
Çavêن xwe dikirin agirdan.  
Peyvêن xwe dikirin stiran.  
Dikirin reşeba. Dikirin baran. (rûp 23)

#### TÊBÎNIYA DUYÊ

Em hêşta Sema û Zemînê jiber dikîn.

هەوالنامەی کتىب

Pêkenokên Mela Nesreddînî jiber dikîn.  
Em hêşta li ser gurzê Rostemî, şerî dikîn.  
Em hêşta. Em hêşta  
Li cigarekêşan û qisekirinê.  
Didîne yek, kerb û kînê.  
Em hêşta . Hêşta nan û ava me tal e.  
Guhêñ me kerr in. Devê me lal e.  
Ger min kariba. Da helbesta şewitînim  
Ger min kariba. Da tif kime wî şairê  
Ji bo qeteke nanî...  
Peyv şkandîn, peyv firotîn bi erzanî.  
Xwe avête ber dergehê soza sultanî... (rûp 28)

\* Sema û Zemîn, çîrokeka bê nirx e û ne hejî xwendinê ye.

#### AGEHDARIYA DUYÊ

Hizar sal e bi serşûrî ji dayik dibîn.  
Hizar sal e bi serşûrî dimirîn.  
Hizar sal e pira Sîratê dibirrîn. Her dibirrîn.  
Ber bi dozexa karesatê  
Rêwîtiya me ya ber bi boşayıyê bi dawî nehat.

هەوالنامەی کتىب

Bi dawî nehat, xem û birîn.  
Dayê, dayê dîsan Ke'be herriftiye  
Tevaya eşîrên dinê têkel û pêkeliye  
Mihemed kanê? Mihemed kanê?  
Pisyara wî bikîn ji Xudayê cîhanê.  
Bila bê. Bila bê, bi dawî bê fitne û giriftarî.  
Bila bê. Bila bê, xweştiviyê bike av û nan, bike diyarî.  
Xweştiviyê bike baran.  
Bike têra me tevan.  
Bila bê. Bila bê. Bila Bîlal bê  
Me ji dîliyê rizgar bike.  
Nexşeyeka din ji bo bajarî çê bike. (rûp 30)

\* Bîlalê Hebeş: Bangdêrê pêxemberî bû li destpêka  
belavbûnê musilmanetiyê.

EZ NE FALÇÎ ME,  
LÊ DIBÊJIM EZ DIZANIM

Ez dizanim

هەوالنامەی کتىپ

Çewan dê av vegere rûbarî.  
EZ falçî nînim, lê dibêjim, ez dizanim  
Kengî, kengî. Dê Mehdî vegere bajarî.  
EZ falçî nînim, lê dibêjim ez dizanim  
Kengî, kengî dê buhar ête vî warî. (rûp37)

\* Mehdî: Mihemed El Mehdî, di mezhebê şîan de, imamê  
duwazdê ye. Ew niha di berzebûna mezin de ye, lê wê rojekê  
vegere û xweşiyê îne dinê.

PORA WÊ KEÇÊ, KONÊ DEFİT Ü ZOZANÊN MIN E  
(Diwana helbestan, Silêmanî 1977)

هەوالنامەی کتىپ

BIRYARA DAWIYÊ

Hejarîno.

هەوالنامەی کتىپ

Eger nebûme ewrekê xwînê û min destê evîna xwe  
Di gerdena çiya, nealand û nekire yar, ev bajare.  
Tif kine helbestên min û  
Takekê darberûyê bo min bikine qinare.  
Ez ci me eger hûn navê min jiber nekin.  
fiair kî ye, ci ye, eger hûn tacî li ser nekin?  
fiair ci ye eger kurr û keçan  
Helbestên wî nekirine lawik û heyran?  
Kî şairî nas dike?  
Eger keça tepeserekê,  
Xwe bi takekê helbestên wî ve, şor neke? (rûp 10)

#### STIRAN

Min stiran ne dizanîn,  
Hejaran ez fêr kirim.  
Xeyidîn ne dizanî,  
Zordaran ez fêr kirim.

هەوالنامەی کتىب

Xweştivî ne dizanî,  
Rûbar û çeman ez fêr kirim.  
Min her helbest ne dizanî,  
Evîndaran ez fêr kirim.  
Dest û pên kelaştiyêن pêxasêن  
Cotkaran ez fêr kirim.  
Eger mirin jî her neba,  
Ez da di pênavâ hejaran de mirim. (rûp15)

#### ZÊYÊ HELBESTAN

Min xeyal kir.  
Vê şevê hemî keçêن Kurdisatanê.  
Periyêن seranserî baxçê esmanî,  
Di jora min de, wê ketîne geranê.  
Yek bi yek li dilê min digeryan.  
Nezanîn ku dilê min, ji min jî xeyidiye  
Di navbera memkên te de  
Bûye rûbarê helbestê û girrnijiye. (rûp 29)

TU

Ez hest dikim,  
Di dilê min de, dilekê din heye.  
Eger tu biruski yan bayî?  
Di nav herdu dilên min dayî. (rûp 39)

هەوالنامەی کتىپ

## DÊ ÇİM

Dê çim dayê  
Eger êdî nehatime ve  
Dê li wî çiyay bime gulek.  
Dê çim dayê  
Eger êdî nehatime ve  
Li her cihê zordar bijî  
Dê li wêderê bim bombayek.  
Dê çim dayê  
Eger êdî nehatime ve  
Dê bime bosteka erdî  
Bo dinyayeka mezintir ji vê cîhanê.  
Eger êdî nehatime ve  
Ruha min dê bite reşeba û li te gere

هەوالنامەی کتىپ

Li ber dergeha, li kolanê.  
Dê çim dayê  
Eger êdî nehatime ve  
Ruha min  
Peyva gişt şairekê jîr e li meydanê. (rûp 47)

#### BIZMAR

Direw nîne  
Ger bêjim: Di bazarên cîhanê de  
Kitek bizmar nemaye...  
Direw nîne  
Di zîndanan de, hemî di dest û pêñ  
Evîndara de kutane... (rûp 79)

TAWAN

Dema helbestvanêن xesandî  
Di bin maseyêن baranê de  
Diverişan û mîz bi xwe de dikirin.  
Hezaran tepeser û rût, di vî bajarî de  
Ji birsan dimirin.  
Ne şairekê  
Ne radyoyekê  
Ne rojnameyekê  
Nexêr, bas nekirin. (rûp 82-83)

هەوالنامەی کتىب

## MIN HEZ DIKIR

Min hez dikir di binarê Helgurdî de  
Darberûyek bame.  
Min hez dikir, li deşta fiarezûrê  
Kaniyek bame.  
Min hez dikr di Kifrî de  
Coyek bame.  
Lê ez şair im û hez dikim  
Keçek min di dilê xwe de bivesêre... (rûp 89)

Dema hatim  
Dergeh li min daxistin  
Namek dan destê min  
Ji min re gotin: Bê welatî  
Her hîngê.  
Min biryar da, bişewitînim  
Nexşa vê cîhanê. (rûp 114)

Dema hewşa zordarekê  
Bi gula dixemlînin  
Gul nîne, birîna hejarî ye.  
Dema takekê darê dişewitînin  
Dar nîne, dilê evîndarekê ye.  
Dema li ser maseya dewlemendekê  
Bîrek dadinê  
Bîre nîne, xwîna paqija bêkarekê ye. (rûp 115)

## BO KEÇEKA EZ NEDÎTÎ

Dibêñ: Helbestêñ min bi dilê te ne.  
Dibêñ: Helbestêñ min li cem te gul in.  
Dibêñ: Ji dil dixazî min bibînî.  
Keçê nekey bikevî nav rûbarê evîna min  
Keçê nekey bibî, şeyda û têhniyê dîtina min  
Keçê nekey xeyal bikî, bibî dezgirtiya min  
Digel ku gelek req, hişk, nexwes û xemgînim.  
Heta bêjî, zerpetixî û nesirînim. (rûp 137-138)

## MEZINTIRÎN BIRÎN

Dema diya min mir.  
Ne stêr ji esmanî rijyan  
Ne masiya koç kir!  
Dema diya min mir.  
Ne rondikek ji çavê esmanî der bû!  
Ne tewalek di xemê wer bû!  
Ne jî guleka quntarî sis bû!  
Dema diya min mir.  
Ne heyv û ne jî roj berze bûn  
Periyekê jî li ser serê wê momek hilnekir.  
Dema diya min mir.  
Erd her wek xwe bû.  
Lê di nav dilê min de  
Dergehê kûrtirîn birînê vebû.  
Ay yadê, dûriya te pirr giran e.  
Dûriya te, ne qirraqîcîna têhnê ye  
Ne zîzbûn û dilmayîna dezgirtiyê ye  
Ay dayê  
Dibême sekroka, sekrok

Dibême birînê, birîn  
Dibême gulê jî, gul  
Lêbelê dayê  
Êdî heta hetayê.  
Bêjime kê dayê...? (rûp 22 - 23.)

**BAHOZA SPI**  
**(Dîwana helbestan 1978 )**

هەوالنامەی کتىپ

## DERMANÊ PÊKENÎNÊ

Em di çerzekê de dijîn.  
Xem tê de bûye hingivîn.  
Bûye dundirmê, bûye Espirîn.  
Ev çerxe, çerxê Mişk û Kuliya ye.  
Çerxê birînaye.  
Li ci dermanxanekê,  
Ji bo pêkenînê, derman tê da ye.! ( rûp 10)

هەوالنامەی کتىب

## TÎR

Ez bûme mij û çûme esmanî  
Min bersîngê Xudê girt û da ber palan.  
Qupçe nebû jê biqetin,  
Dev jî nebû bête ziman.  
Ez vegeryam û min takê darberûyeka pîr,  
Kire tîr û kevan.  
Min hejand seranserî cçhan. (rûp 12)

ROJNAME

هەوالنامەی کتىپ

Hejarîno: Li her çi cih û devera  
Li her çi welat û dûrûbera  
Rojnama newêra bêjin:  
fiahê bajarî rût û pîs e.  
Yê bê cile, li erdê ye.  
Rojnama newêra hewar bikin:  
Tacê fiahî ji kaxezê ye.  
Rûpel rûpel, rojnama bidirînin.  
Bajarê xwe ji bin gîfkê,  
Direwên rojnama derînin. (rûp 16)

EWIR DIBE ÇI

Ewir dibe takê darê  
Teyir li ser çêdikin hêlinan.  
Dibe tîr û kevan,  
Disime dilê pezkûvî û kewê ciyan.

هەوالنامەی کتىب

Dibe xêliya zîvî, ji bo stêra perçem şîn.  
Dibe landika zarokê xweşik û şêrîn.  
Textê razana keça nazenîn.  
Kivark. Dombelan. Kengir.  
Kaxez. Rûbar. Gijlok. Befir.  
Hezar hezar tiştên din,  
Lê nabe şîir. (rûp 25)

#### BO GÎVARAYÎ

Bûye gula hemî dara  
Stirana zarokên gişt wara  
Dildarê tevaya keçêن hejara  
Bûye ewrê xwîna xeyidî û  
Te lihiya xwe berda tevaya rûbara.  
Bûye takê nêrgizê û maç kirî,  
Porê nazdara.  
Bûye maç û keftiye ser lêva dildara.  
Te tewal fêr kirin ku çewa di şevêن reşeba de,  
Bilind bifirin û stirana bêjin.  
Te şair fêr kirin,  
Dema li her welatî murekeb û pêñûs neman  
Helbesta bi xwînê darêjin. (rûp 31)

Eger nexşeya hemî cîhanê biguherînin.  
Eger erdî mîna pembî biveçirrînin.  
Dema sinora deynin  
Dîsan dê vejerim vî bajarı.  
Kurdistanê tu welatî û şirîn warî. (rûp 33)

#### DERYA

Ji min pirsîn: Tu li çi digerî hinde.  
Min got: Li deryayeka ku, winda bûye  
Di dilê min de.  
- Em nizanîn tu çi dibêjî?  
Ew zimanê pê dipeyivî, me ne bihîstiye!  
+ Ka , min çi negotiye.  
Ez lal im. Eger rojekê biaxivim  
Dê hewarkim:  
Ev bajare tev de nivistkiye.  
Ev bajare tev de miriye. (rûp 82)

ROJ

Welatê min tabot nîne  
Bikine di çala de.  
Li jêr jenga pêlavên sala de.  
Welatê min bomba ye  
Dê her peqe di bin postala de.  
Evca hîngê, roj mîna dilopê,  
Dilop dilop  
Dê dabeşbe bi ser mala de. (rûp 95)

**EW HELBESTA KU BI DAWÎ TE Û BI DAWÎ NAYÊ**  
( Diwana helbestan, Silêmanî 1979)

هەوالنامەی کتىب

(2)

Dema sibehan  
fieprepa şaperên rojeka nû  
Ewrê xewên min radimale û bi îşiyê girnijînê  
Çavêن min yên westiyayî giran dike  
Xemeka wilo entîke bi ser min de dibare  
Wilo hest dikim ku ji bo şairî  
Jin ji nan û avê jî pêwîstir e..!

Keçê dê were...  
Bila di navbera maçekê û yeka din de  
Gula maçeka din biçînîm û

هەوالنامەی کتىپ

Mîna lawê şivankarê zozanan...  
Stiranên pembeyî bo te bêjim û  
Tezîneka hênik ya lezeteka kesk  
Ji çavêن te yên xewgiryî bidizim  
Di nav helbestêن xwe de biveşêrim.! (rûp 8)

(7)

Min dilê xwe mîna çiyayekê asinî hilgirtiye.  
Li dergehê dilê wan keçikêن ciwan didim  
Yêن ku min dinasin, nanasin û min hêviye.  
Keçek nîne di vî bajarê şûşeyî de  
Min di dilê xwe de himbêz bike.  
Ji qamçî û gurzê tenêbûnê rizgar bike.  
Keçek nîne ku pirça xwe ji bo çûka  
Helbestêن min yên nû, bike hêlin û ware.  
Çi keç nînin, her nebe  
Pirça xwe ji bo min bike qinare.  
Ne, keçek nîne guh bide min  
Ev e ne dêw e, ne jî kafir.  
Li dergehê kevirînê dilê we dide  
Ey nazdaran... fiair e... fiair.! (rûp 17)

(18)

Peyvên te xweş in, mîna recifîna  
Çêja xewna sibehêka sar.  
Xeyidîna te xweş e, mîna nanê gerim  
Û ez jî mîna hemî zarokên Kurdistanê  
Hez nanê gerim dikim.  
Dê bixeyid e.! (rûp 35)

(24)

Ez gelek hez dikim jinê bînim  
Ez gelek hez dikim di navbera baskên jinekê de  
Çavêن xwe danim serêk û bêhna perasiyêن wê bikim.  
Ax, min çend pêwîstî bi jinekê heye  
Ez xweş bivêm,  
Di vî çerxê ku tê de, çermê şairî dibe postal.  
Ax, min çend pêwîstî bi jinekê heye  
Di çerxekê de, bo min bibe hêlin.  
Ku nexwestirîn hotêl, ji bo şairekê nabe hêlin.!  
Dema ez hest dikim ku jinek nîne  
Guh li dengê zengila dilê min bigire  
Û li nîveşeva helbestên min bidize û bide ber bayê cada  
Kêra şermê min digurê û mîna kulmeka xwê ya nav avê  
Parçe parça dihelim.! (rûp 45)

(50)

Dilê min dergehek heye  
Ji bili evîndara min, kesê din nagehê.  
Evîndarêñ befrê ji nebin,  
Kesê din bêhna gulêñ nihêniyêñ  
Welatê min yê şirîn nake...  
Welatê min yê şirîn di dilê min de ye  
Nizanim çend pişkêñ dilê min dagîrkiriye!  
Lê hest dikim, hemî dema mîna:  
Bay...  
Evîn...  
Xewn...  
Her mezin dibe.  
Her mezintir dibe.

Ne şair di zimanê zarokan digehe  
Ne ji ez dizanim  
Welatê min yê şirîn çend fireh e.! (rûp 99)

(51)

Ez nizanim çûkêñ dûr

هەوالنامەی كتىب

Xewê bi çi ve dibînin.!  
Lê hez dikim, di şeveka sara zivistanê de  
Bibime ewrekê xwînê  
Û di navbera memkên te de  
Dirêjtirîn helbestê binivîsim.  
Ez şairekê zarok im  
Cudahiya di navbera min û zarokan de  
Ew hez li dayikên xwe dîkin û  
Ez jî hez li te... (rûp 101)

**EW NAMÊN KU DIYA MIN NAXÎNE**  
**( Dîwana helbstan, 1979)**

**DIBÊN**

Xem: Mîna pisîka  
Mîna kotira, kehî dibe.  
Her wesa şadî jî  
Stêr jî  
Helbest jî  
Ez nizanim. Dibêن keç jî.! ( rûp 46)

TIKA

Nehêle ba  
Wek zarokekê netebitî  
Yariya bi pirça te bike  
Bêje: Paşî ew şairê şeydayê porê min bûy  
Dê tolê ji te veke. (rûp 48)

( 27 )

Min kîn ji matmatîkê heye, lê pîrek û nîstiman xweş divê.  
Ez dizanîm ku ne nobedar im.

هەوالنامەی کتىب

Ez şair im.  
Ez dizanim ku min kerb ji nobedariyê heye  
Lê dema te dibînim  
Rola nobedariyê dilizim.  
Ez dizanim te çi tiştên qaçax ne veşartîne.  
Lê çavê min hez dike hemî aliyêñ laşê te bibîne. (rûp 49)

#### BO DIYA MIN

Ey dayikê  
Mîna xencereka bê kavlan  
Dê te di dilê xwe de hilgirim.  
Çi xwestir e:  
Ji bilî ku bi evîna te bimirim.! (rûp 52)

#### NOBEDAR

fiev ta sibehê  
Nobedarê dilê xwe me  
Neku pisîkeka birçî ji nişka ve bixwe  
Yan jî keçek bi dize û bibe.! (rûp 55)

## PEYV

Eger peyv bimiriba  
Her dema helbestvanekê derewîn  
Destê xwe  
Devê xwe  
Bo biriba  
Êdî dimir... (rûp 56.)

## GULLE

Di vê jorê de zarokek destê xwe  
Li îşiyekê elindê dide.  
Di karxana wî alî de  
Vaye gulleyek dirust dibe.  
Ay kî dibê  
Ew gulle  
Ew gulla pirr bi kerb û kîn.  
Rojekê dilê vî zarokê gelek stiran, xewn û xwezî  
Ji bo xwe nake hêlin.? (rûp 57.)

SIRUDA HEJARAN  
( Dîwana helbestan, Bexda 1983)

هەوالنامەی کتىب

## DU DEST

Min du dest hene  
Bi yekê nêrgiza diçînim  
Bi yê din jî  
Li ser xodîka hemî rûpela  
Helbestan direşînim...!

Min du çav hene  
Bi yekê awirekê li çavê te yê geş didim  
Bi yê din jî  
Têr temاشayî esmanê berfireh dikim...!

Min du dil hene  
Yek hogirê bêhna gulava girrnijîna te bûye  
Yê din jî  
fieydayê kopê çiyayî bûye...! (rûp 14)

## NIVÎSÎN

Pîrejin vedgêrin: Berî hezar sala  
Bi şev zarokekê  
Li ser dîwarekê  
Bi qasî zerka hêkê, çêkir wênê rojekê.  
fia di wêrê re borî bû  
Ew roja biçûk dîbû  
Çav çûbûne serî û sewdaser bû

هەوالنامەی کتىپ

Dema xelkê bajarî, hêka kevin şikandî  
Zarok li qinarê dabû  
Êdî qedexekir li wî warî.  
Zarok wêna çêkin li ser dîwari...! (rûp 18)

## GIRRNIJÎN

Bibe esmanek, esmanê evînê  
Ez dê bime heyvek.  
Bibe du çav, du çavên şîn  
Ez li dor wan bime birh û mijîlank.  
Bibe lêv, dê bim girrnijîn û pê ve nîsim.  
Bibe çiya, dê bim dargûz û li kopê şîn bim.

Dema bostekê ji te dûr bim  
Ne helbest xweş e. Ne xewn û ne xew.  
Ne bêhna sermemkên gulaviyên jina bedew.  
Dema bostekê ji te dûr dibim  
Koratî bi çavên min de bêñ, ey welat.  
Bibe maç, dê bim lêv  
Bibe roj, dê bime çiya û lat. (rûp 28)

## BO STÊREKÊ

Ey stêra çav ges û rohn.  
Cihê te bilind e û tewalên şevê,  
Birr birr evîndarêñ te bûn.  
Xewnêñ xwe,  
Di nav daristana pirça te de, dadinêñ.  
Xwezikêñ te,  
Ne zîndan çaverêyî te ye,  
Ne birîn di laşê te de, dizêñ.  
Em herdu dê mirîn...  
Tu di kopê bilindê esmanî de.  
Ez jî bi kelebçe, di zîndana teng û tarî de.  
Em herdu dê mirîn... (rûp 39)

## PÎÇEKA RONAHİYA XUDÊ

Pîçeka ronahiya Xudê,  
Çiyayê Tûrê kire xwelî û dana pêş.  
Pîçeka ronahiya Xudê,  
Hezaran rêberzeya dike derwêş.  
Pîçeka evîna Leylayê,  
Dilê hezaran Mecnûnan,  
Tejî dike, ji helbestên pirr xem û êş.  
Lê çira agirê ewrê derûna,  
Hezaran miljonêñ birçî, rût û bextres.

هەوالنامەی کتىپ

Erşê Xudê nasojin û nakine, barûta reş.!? (rûp 40)

EV RÜBARE HİFİK NABE  
( Diwana helbestan, Bexda 1991)

هەوالنامەی کتىب

fiÛfiA BÊHNE

Her pênc tiliyên min bûne pênc şûşeyên gulavê  
Dilop dilop gulav jê dirije  
Ne bêhna baxçeyî wilo xwes e  
Ne jora şeva boka gundi.  
Ne bixora elindacejna mizgeftê.  
Dibe ji ber hindê be  
Dema min cente ji te wergirtî  
Destê min yê rastê, bi destê te ket...!  
Ez nizanim... Her ji wî demî  
Her pênc tiliyên min  
Dibêy pênc şûşeyên glavê ne...! (rûp 25)

## DU RENGÊN MIRINÊ

Dema biruska mirinê, şûşa ruha we dişkêne.  
Di Kasên jorêن we yên nepenî de  
Zêr û pare bi cê dimînin.  
Lê dema mirin ber bi min tê,  
Taca rêuîtiyê li ser serê min dadinê.  
Di şûşeya peyva helbestêن ciwan de  
Ez gulava evîna welatî bi cê dihêlim.  
Dema Dêwê mirinê we li ser dirrik û keleman  
Ber bi goristanê radikêše.  
Kepreka asinî  
Li çar aliyêن gora tariya we çê dike  
Ez jî, dema çira di jora dilê min de divemire  
Keça fiazadeya welatê xewê  
Bi nazdarî tê  
Gora min bi ronahiya rojeka mezin ges dike.  
Darkezaneka welatê min jî,  
Ji rihan ve tê ser serê min  
Ew bi xwe dibêje:  
Ev şaire, serxweşê min bû.  
Bila bi tenê nebe.  
Du kotir jî, dê ên û li ser takekê darkezanê  
Hêlînekê çêkin.  
Her dema du evîndar, ji bo jivana paqij  
Li bin rûdinên  
Dê stiranên evîna min bo wan bêن.  
Dê gulava helbestêن min li wan reşînin... (rûp 31)

## WÊNÊ NEMIR

Ez dilniyam e  
Dê rojekê merg ête pêşwaziya min  
Lê hezaran hezar sal,  
Li dîf mirinê.  
Min ji gorê û çalê derînin  
Eger sîngê min bi kérê bidirînin  
Hêşta li ser birîna dilê min diyare,  
Xweliya gundê min  
fiopa zincîra tanka dijmin...!  
Bost bi bost ev xake.  
Cihê bizmarên Pasdar û Safake...! (rûp 43)

## QEDEXE

Her ji dema roj, heyvê direvîne.  
Bi tenê du tişta dilê jinkê girtîne.  
Bi tenê du tiştan.  
Yek: Ciwaniya wê  
Du: Helbest  
Her ji dema çiya, çiya ye  
Paşay jin xweş divê û  
Çav li helbestê nedaye  
Her çi Paşa ye  
Nobedarê taybetiyê xwe danaye  
Her çi dergehe, vekiriye  
Ji bo keça ciwan û jina rind.  
Qedexeye yek helbest jî,  
Serê xwe bigehîne pencera koçka Paşay ya bilind...! (rûp 45)

## EVÎNA NEMIR

Ez evîndarê gelek tişta me  
Pênûs û kaxeba me  
Dev tijiyê sermemka me  
Lêvên ne ketîne ravê  
Porê zertir ji hetavê  
Sema dar û keniya derya.  
Lê çi ji wan, di dilê min de  
Najîn mîna evîna çiya. (rûp 48)

## DILÊ MIN

Dil di sîngê min de nemaye.  
Min li cihê dili, wênekê te danaye.  
Centêن xwe serûbin ke  
Nebê wî guman ji min e  
Dibêm neku te wesa zanî be  
Dilê min şûşe ye, gulav e  
Bizanî bi wî xeyalî  
Te li qulaça centekê deyna be...! (rûp 49)

## GUL Ü YEKNASÎN

Hemzatovê şair dibê:  
Çiyanişînên Daxistanê  
Dema ji bo seredana diçin.  
Xencera ji hevdu re dibexşin...!

Dê bila ji bo mukum kirina peywendiya  
Her çi xencere bişkêniñ.  
Dema hevdu bibîniñ.  
Guleka nêrgizê di hewşen hevdu de biçinîn... (rûp 50)

## DENG

Bila reşeba bivrê jengî pavêje,  
Nêrgizekê divê ges bibe.  
Bila tiveng bêdeng bin,  
Zarokekê divê razê.  
Çi Qeyser û Paşa hene, bila guh bidêrin  
fiairekê divê bipeyve.  
Yê nikare bibe gul bo perçema keçekê.  
Nikare bibe dirrik bo pêñ zordarekê...! (rûp 55)

## QERZ

Min hind helbestên pordirêj  
Bo keçêن rind gotîne.  
Tevaya keçêن cîhanê,  
Qerzarêن maçêن min bîne.

Bo çi helbesta min  
Mal bi malêن bajarî digere?  
Kîskê xenayê û xweziyêن mezin,  
Bo her keçekê hildigire.  
Lê dema ji serbaziyê vedigerim,  
Keçek maçekê nade min.!  
fioxek nayê pêşıya min...! (rûp 60)

NAMEYEKA VEKIRÎ  
DI PÊFiWAZIYA SALA 1996 Ê DE

Ev e rojeka nû li ser kopê Gilezerdî  
Hêlînekê ava dike ji xwe re.  
Bi xêr hatî ey sala nû  
Me çi nîne pêşkêş bikîn ji te re.  
Ji bili rondik û xewnan.  
Ev e derbeder li benda te ne dîsan.  
Tu wan dinasî?  
" Derbeder ji dûr ve diyar in  
Rût in... Birçî ne... Xembar in."

Ev e ew dayika cilres  
Li ber te digirî...  
Ew dayika cilres, çira digirî?  
Bo lawê xwe yê êkane digirî.  
Dema şerê birakujiyê ji xwe re birî...

Awirekê bide... Bibîne.  
Kurt û dirêjiya karesatên sala bûrî  
Di çavêv vî lawî de bixwîne.  
Ev lawê niha bi gultey xwe dihejîne.  
Pêrar xorkekê çeleng bû.  
Rihêñ xwe kurt dikirin û di gulavê wer bû.  
Diçû jivana û ji bo dost û hevalan, li hev bû.  
Par şerê navxwe, di ser rîyekê de  
Pêyek lê gezî.  
Gulte xiste bin destî û lê kuştin xwezî.

Bi xêr hatî sala nû  
Serincekê bide li mizgefta mezin.  
Ew welatiyêñ vê Kurdistanê ne  
Wan serhildan kir, lew dijmin dibezin.  
Parsekê dikan...  
Pariyê nanê hişk dikirrinin.  
Di rûmetê wan de diyar e ku xem digezin.  
Serincekê bide, ew zarokêñ Kurdistanê ne.  
Kurdistana du milyon şehîda ne.  
Gulberoj, cigare, kuncî, luqmeqazî û  
Paşmayêñ bab û bapîran difiroşin.  
Di ser hindê re, bi têl û kabila li wan dixin.  
Dibe ev e di bîranînan de be  
Di serhildana du yê de,  
Van zarokan, tankêñ Diktatorî dîl kirin.  
Ev e zarokêñ hejarêñ Kurdistanê ne.  
Zarokêñ şehîdêñ Kurdistanê ne.  
Ey komela parastina zarokan  
Tu li kî rê yî?  
Ey mafê mirovan  
Tu li kîjan qehwexanê, sergermê Tawle û Domînê yî?

هەوالنامەی کتىپ

Bi xêr hatî sala nû  
Serincekê bide li keçkokên xembar.  
Ew zarokên şehîdên şerê birakujiyê ne, hawar.  
Te mizgîniyeka xweş ji wan re aniye?  
Ev e govenda dayikbûna saleka nû ye.  
Ay çi govendeka sar û sirr e.  
Govendeka bê şekrok  
Bê stiran û bê dîlan e, serbirr e.  
Kanê keçên xort û ciwan?  
Serkêşiyê nakin û tilîliya venadin.?  
Çi tilîli û çi serkêşî?  
Birayê wan di şerê navxwe de, windabûn li pêşî.  
Ey sozanî û fêlbaz  
Ey pîstirîn nexweşiyê birakujiyê  
Tu ji kî rê hatî û  
Te ev hemî kîn, kerb û goristane dirust kir.?

Bi xêr hatî ey sala nû  
Çi di torkê te de ye, te çi anî?  
Gulegnim û aşitî, gulenêrgiz û biranî.  
Yan jî kelex, xwîn û malwêranî?  
Ey sala nû  
Tu mîna sala bûrî neke  
Sala bûrî dilreq bû.  
Tewalêن ser cadan koçber kîrin û her rev bû.  
Kotira girrnijîn û aşitiyê, nêçîra çifta bû.  
Kurdistan.  
Kire Mergistan.  
Em hemî ji bo pêşwaziya te hatîn û me hêviye.  
Her çend em destvala ne, lê dilê me pirr xwestiviye.  
Me gul divêن, neku gulle.  
Me nan divê, neku rondik.  
Me kar divê, neku sitem û hutik.  
Me girrnijîn divê, neku peyvêن rengîn.  
Me aşitî divê, neku şerê birakujiyê û xwîn.  
Tîrsinok in yên besdarî şerê birakujiyê dibin...  
Qareman in yên aşitiya navxwe dirust dîkin...!

\* ( Kovara Dengê Melbendî, hejmar 1, Emerîka 1996, rûp 29 - 30.)

Eve jî çend helbestên bi kurmanciya jêrî ; lê bi tîpêن  
latînî ne, pêşkêşî xwendevanêن xweştivî dikim... .

هەوالنامەی کتىب

**AMADEBÛN BO LE DAYIKBÛNÊKÎTIR**  
**( Dîwana helbestan 1973)**

**XOŞEWÎSTIM**

Xoşewîstim.

Xem farxon e, firoke ye, paporr e  
Paseportî hestiyarêkî aware ye.

Nan û awî minalanî em şare ye.

Bergî xor e.

Xem xanuve, çayxane ye.

Xem otêl e, pare ye.

Xem şimsêr e. Xem yasa ye. Xem çeqo ye.

Lem şare da, xem polisi hat û çûye.

Ewa minîş le ferhengî dildarî da

Dastanî xem enûsim.

Le ser perrey tasey çawenwarri da.

Mêjûy şewî agirdanî xem enûsim.

Nawnîşanî xem enûsim.

Bo ewaney eyanewê

Hetawêkîtir bikewê.

Xoşewîstim.

Nazanim kê xem exate şaney honrawekanim?

Nazanim kê xem ekate

Gerdaney honrawekanim?

Xoşewîstim.

Bimşorewe be niske û soz.

Girri maçim bo bikere yekem newroz.

Raweşêne liq û popî darî birîn.

Milwankwyek dirust bike le gela û gulî ewîn.

Le ser liqî darî yadgar.

Helbikole beserhatî dildarî şar.

beserhatî Pêşmergeyekî serbirraw

Le jêr janî darberrû da, heşar dira.

Beserhatî ew rîbwarey ke wutî - Aw -

Le tînwêti le dar dira.

Beserhatî ew dildarey ke şêt bû bû bo hetaw

Wek wêne le dîwar dira.

Xoşewîstim.

Eyanewê biman kirrin.

Eyanewê nexşe û kûdetakanman bidirrin.

Eyanewê biman kujin, serman birrin.

**هەوالنامەی كتىب**

Belam giyane. Hergîz megerrêrewe.  
Were were.  
Bawer çekî cengawer e.  
Eger çî dujminekanman dirrin.  
Xoşewîstî bo hemû sengerekan bere. (rûp 21 - 23)

Papor:	Gemi, keştî
Hestiyar:	Helbestvan, şair
Aware ye:	Mişext e, sirgün kiri
Şimşêr:	Şîr
Tase:	Bîrakirin, pirr hezkirin
Mêjû:	Dîrok, tarîx
Enûsim:	Dê nivîsim
Hetawêkîtir:	Hetaveka din
Nisko:	Kelegirî
Liq û pop:	Takên darê
Milwanke:	Stuvank, ristik
Rêbwar:	Rêvîng, rêwî
Tînwêtî:	Tî bûn, têhn, bê avî
Şêt:	Dîn, aqil ji dest dayî
Wêne:	Resim, şikil
Hergîz:	Çi car, qet
Megerrêrewe:	Ne vegere, paş de neyê
Senger:	Çeper, kosk

## DENGÎ YEKEM

Ger emtiwanî. Ger emtiwanî.  
Şarekemim erûxan.  
Çawekanî xomim ekird be agirdan.  
Wuşekanî xomim ekird be goranî.  
Be reşeba. Be baran. ( rûp 23)

Emtiwanî:	Min karîba , min şiyaba
Erûxan:	Di herrifand
Xomim:	Yêñ xwe
Wuşekan:	Peyv
Ekird:	Dikir
Goranî:	Stiran, lavje

NAMEYEKİ NIHÊNÎ BO  
PÊŞMERGEKAN

Werin. Werin nexsey şerrêkîtir bikêşîn.  
Werin. Werin nexsey sengerêkîtir bikêşîn.  
Werin. Werin lem rîyewe bomba bînîn  
Elêrewe dergay polay qelay Xeyber birûxênîn.  
Werin. Werin ba birînî Pêşmergekan  
Xoşewîstî agirînî Pêşmergekan.  
Pêkenînî Pêşmergekan.  
Şayî û şînî Pêşmergekan.  
Bikeyn be ferhengî zimanê nwê  
Bo minalêk ke sibeynê  
Ziman le demya errwê.  
Le kungirey dengekana  
Le dastanî tole edwê. (rûp 29)

Lem rîyewe:	Ji vê rê
Elêrewe:	A ji vira
Kilpe:	Gurriya agirî
Qîn:	Riq, kerb, kîn
Nwê:	Nû
Minal:	Zarok
Le demya:	Di devî de
Kungre:	Kongre
Dengekana:	Denghejmartinê
Edwê:	Dipeyive, diaxive

PIRÇÎ EW KIÇE REŞMALÎ  
GERMIYAN Û KWÊSTANÎ MIN E.  
(Dîwana helbestan 1977)

## REG

Darberûyekî tînû bangî pelehewrêkî kird  
- Ey pelehewre dûreke, bişkêne tînwêtî lêl im.  
- Ey dareke, were bo lam xot bidere berşestebaranî wêl im.  
Were bo lam, lêm metirse. Xo min ne paç im ne bêl im.  
- Ey hewreke to dûrît û axir minîş  
Xo egerçi bîşimkujî tînwêtî tal û lêlim.  
Lem xake da regim heye û cêy nahêlim... (rûp16)

Reg:	Rihên darê
Tînwêtî:	Tîbûn, têhnatî
Lêl im:	Şêlî, ne zelal
Bo lam:	Li cem min, li def min
Wêl im:	Winda me, berze me
Ne paç im:	Ne bivrim, ne tefşî me
Ne bêl im:	Ne merbêl im
Xak:	Erd, zemîn

KEW

Şewê le şewan, Sultan  
Beçkekewêkî girt le kejêkî dûrî kwêstan  
Kiçî Sultan tewaw hogirî kew bû  
Kew le koşya fêrî xew bû  
Sal hat û çû  
Kew gewre bû  
Kew balî girt  
Şewê pencerekânî şikan  
Bangî lê kird kiçî Sultan:  
Bo kwê derroy ey kewî ciwan?  
Kwê le koşim germtir e.  
Çî lem koşke beriztir e.?  
Kewî fêrî befrî kwêstan.  
Witî: Lütkey çiyakanî Kurdistan. (rûp 18 - 19

Le şewan:	Ji şevan
Beçkekew:	Têşkekew
Kej:	Çiya, şax
Kwêstan:	Zozan
Hogir:	Heval, dost
Balî girt:	Per ji bo çêbûn
Koşk:	Qesir
Witî:	Got
Lütke:	Kop, kumt, serê çiyayî

## ŞÊT

Ger şêtîş bim, şêtî pare û dînar nîm  
Ger şêtîş bim, şêtî koşk û telar nîm  
Bo çî minîş weku êwe,  
Şêtî mîz û eskemîlim  
Bo çî minîş weku êwe,  
Şêtî şêwey otombîl im  
Bo çî minîş weku êwe  
Şêtî şewî barekan im  
Şêtî semay kiçî tiyatroy şarekan im  
Bo çî minîş weku êwe şêtî naw im.  
Ya min şêtî tiruskeyek hetaw im. (rûp 48)

Şêt:	Dîn, aqil ji dest dayî
Telar:	Qisir, koşk
Mîz:	Mase
Eskemîl:	Kursî
Şêwe:	Modêl
Sema:	Dîlan, govend, reqs
Tiruskeyek:	Sînahî, ronahî

SERETAY EWÎNÊK

هەوالنامەی كتىب

Şairekan min zimanî xomim birrî  
 Le minalî hejarekan  
 Ferhengêkî tirim kirrî.  
 Bo honrawe  
 Le minalî bêkarekan  
 Diruşmêkî tirim dizî.  
 Bo ajawe, birsêtî dengmî kird be maç.  
 Ba birdî bo dildarekem.  
 Bêkarî riqmî kird be paç.  
 Dam le regî dîwarekem  
 Hawarim kird  
 Şimşêrekey Xelîfe  
 Ne niya kîve... (rûp 84 - 85)

Ewîn:	Evîn, dildarî
Honrawe:	Helbest, şiir
Bêkarekan:	Yên bêkar
Ajawe:	Gêleşok, sergêjî
Dengmî:	Dengê min
Riqmî:	Kîna min, xeyidîna min
Paç:	Bivir, tefşî
Şimşêr:	Şîr
Ne niya:	Ne xiste, ne dana nav
Kîf:	Kavlanê şîrî

DILIM HONRAWEY LÊ DEBARÊ

هەوالنامەی کتىپ

Min gwê nademê lem şare teske da  
 Eger zû birromewe û eger direng birromew.  
 Derbest nîm.  
 Ger le penay tarîkî şeqamêk da  
 Bixewim.  
 Ya le jorî otêlêk da.  
 Min her tenyam  
 Ne daykim heye dili lam bê û  
 Ne dezgîranîşim heye  
 Le çawerwanî min da  
 Dili jeng bigrê.  
 Dilim weku destî hejare ladêyekan  
 Qılışawe û  
 Le batî jan honrawey lê debarê... ( rûp 92 - 93)

Gwê nademê:	Guh nadimê
Tesk:	Teng
Birromewe:	Biçime ve
Derbest nîm:	Ne girêdame, ne neçarim
Pena:	Ali, rex
Şeqam:	Cade, rê
Tenyam:	Bi tenê me
Dezgîran:	Dezgirtî
Çawerwan:	Çaverê
Ladêyekan:	Gundiya
Qılışawe:	Şeqkiriye, peqiye

## NEXŞE

Katê hatim  
Dergakanyan lê daxistim  
Nameyekyan naye mistim  
Pêyan witim: Bê welat im.  
Her ew saye.  
Birryarim da bisotênim  
Em nexşeyey em dunyaye. ( rûp 114)

Katê hatim:	Dema hatîm
Dergakanyan:	Dergehên xwe
Naye mistim:	xistine di destêن min de
Her ew saye:	Her wî demî
Bisotênim:	Bisojim

## KOŞK

Ke hewşî koşkî zordarê  
Guljêr dekrê  
Gul niye zamî hejar e.  
Ke liqî darê desotê  
Dar niye dili dildar e.  
Ke bîreyek le ser mîzî  
Dewlemendêk dadenrê  
Bîre niye xwêni hezaran bêkar e... (rûp 110)

Koşk:	Koçk, dîwan
Guljêrdekrê:	gulreşin dibe
Zam:	Birîn
Liq:	Tak, çıq
Desotê:	Disoje
Dewlemend:	Zengî, xwedî pare

**GERDELÜLÎ SPÎ**  
**(Dîwana helbestan 1978)**

هەوالنامەی کتىپ

## MINAL

Minal le dengî zîwînî kotir  
Hergîz tênaga  
Belam dezanê bo berz defrê.  
Minal le wijey spî û nermî ba  
Hergîz tênaga  
Belam dezanê ba daw naygirê.  
Minal nakokî netewayetî û  
Çînayetîş herrenge nezanê  
Belam dezanê:  
Firoke bo çî asoy samal û  
Debabê bo çî dewrî dê degrê... (rûl 23)

Tênaga:	tênagehe
Berz:	Bilind
Wije:	Dengê bay
Daw naygirê:	Dav nagire, nakeve davê
Samal:	Sahî, esmanê zelal
Debabê:	Tank
Dewrî dê:	Dûr û berên gundî

## GIYAN

هەوالنامەی کتىپ

(Helbest bo minal)

Rûbar  
Aw deda kîlgey dê û şar  
Gulzar  
Şagul deda be dildar  
Dar  
Lane deda be baldar  
Rûbar û  
Gulzar û  
Dar  
Beste delên bo behar  
Nîştiman  
Demandatê xoşî û nan  
Minîş giyanim  
Debexşime Kurdistanim... (rûp 32)

Minal:	Zarok
Rûbar:	Çem
Aw deda:	Avê dide
Kîlge:	Mêrg, zeviya kîlayî
Lane:	Landik, dargoş
Delên:	Dibêjin
Demandatê:	Dide me
Debexşime:	Pêşkêş dikim

DESTÎ ŞAİR

هەوالنامەی کتىپ

Hez dekem dilim le pencereket da rût bikemewe  
 Ta bizanî şair çendê dildar e  
 Hez dekem carê kezî û pirçit  
 Bo dilim bikeyte colanê  
 Ta bizanî dili şair çendê Xewaluwe  
 Hez dekem şewê memkekanit  
 Le demim da bitwênîtewe  
 Ta bizanî şair çendê korpe ye  
 ...  
 Ew şewaney ke le jore perpûtekem da  
 Honraweyekî nwê denûsim û  
 Dzebay zistanî xest  
 Destim derrçenê  
 Hez dekem bêm û destim le jêr balit da bişarmewe  
 Ta bizanî şewanî zistan  
 Destî şaire hejarekan  
 Çendê sar e...? (rûp 51)

Rût bikemewe:	Rût û tazî
Pirçit:	Pora te
Colan:	Hêsk, colan
Xewaluwe:	Çav bi xew
Le demim da:	Di nav devê min de
Bitwênîtewe:	Bihelînî
Korpe:	Zarokê biçûk
Perpût:	Ne rêkûpêk, têkçûyî
Derrçenê:	Derke, derêxe
Balit da:	Di destê te de
Bişarmewe:	Biveşêrim
Sarde:	Sare

SORAX

Delên Xwa bo Pêxemberê  
 Şarêkî kird be gomî xwên  
 Lem melbende hemû rojê  
 Çermî Pêxemberê minal  
 Deken be cotê postal  
 Bo cendirmeyekî xwêntal  
 Xwa bêdeng e....!  
 Î bişê Xwa elem şare tûre bûbê  
 Î bişê Xwa be işêkî taybetî xoy  
 Bo şwênenekî dûr dûr çobê  
 Belam kam şwêن?  
 Ey estêre şinasekan de dereng e.  
 Be Teleskop boyî bigerrên  
 Deng û basî em melbendey  
 Be bê kem û ziyad pê bilên..! ( rûp 69)

Sorax:	Pirsîn
Xwa:	Xuda
Gom:	Gol
Ç bişê:	Tu bêjî
Tûre bûbê:	Xeyidî be, aciz be
Îşek:	Karek, şixul
Şwênenek:	Cihek, deverek
Şinasekan:	Yêñ naskirî, yêñ bi navûdeng
Pê bilên:	Bo bêjin

### PÊTAN DEKRÊ

Renge bitwanin nan û awman lê qedexeken  
 Meçekî hemû şairekan kelebçeken  
 Belam natwanin... Na  
 Şiir kotken le zîndana

...  
 Renge bitwanin yesqanekanman yeke yeke  
 Derbênin wek perr û bal  
 Le lûlaqekanman dirust biken  
 Dûzele û şimşal  
 Pirçi yarekanman  
 Tal tal biken be qeytan  
 Kaseserî hezar hezar kiçî ciwan  
 Le dîwexanekantan da  
 Biken be guldan.

Qutabxaney hemû gund û şarekanman  
 Biken be zîndan  
 Hemû xanokanman zewt ken  
 Çirakanîşman bê newt ken

Dar û berd û rûbar biken be qerebirût  
Le çermî mirov dirust biken postal û qapût  
Belam dili çewsawey birsi û reşûrût  
Be hêztir e le barût

\*\*\*

Rojê zewî bo xoyan deken be behest û  
Jêr pêşyan bo zordaran deken be tabût...! (rûp 80 - 81)

Pêtan dekrê:	Hûn dikarin
Bitwanin:	Bikarin, bişên
Meçek:	Dest, zend
Belam:	Belê, lê
Kot ken:	Bend kin, girê din
Yesqanekanman:	Hestîkên me
Derbênin wek Perr û bal:	Mîna pera bi vecirînin
Dûzele û şimşal:	Dudik û bilûr
Kaseser:	Qafê serî
Guldan:	Qafkê gula
Qutabxane:	Dibistan, medrese
Şarekanman:	Bajarên me
Zewt ken:	Dagîr bikin
Bê newt ken:	Bê gaz bihêlin,
Qereberût:	Tiştê sotî û bûye xwelî
Çewsawe:	Jêrdest, hejar
Reş û rût:	Feqîr û hejar, belengaz
Zewî:	Erd, zemîn

SIRUDÎ HEJARAN  
(Dîwana helbestan 1983)

TIRS

Gasinêk şika  
Wek minal girya  
Rondik wek pirrşing le çawî tika  
- Megrî, bo degrît?  
- Şikam û itir zewî nakêlim  
Cûtyar nayewêm, itir natwanê cûtim pê bika.  
Kellem le serenwêlk tûrr deden  
- Detben bo karge û detken  
Be das. Pêmerre  
Ya deşê bitken be deme herre  
Rojê dartaşê  
Bêşkey korpele û  
Mêzî dilgîrit pê dabitaşê  
Axir detirsim.!  
- Le çî detirsî, debilê le çî?

هەوالنامەی کتىپ

- Detirsim bimken  
Be deme birrben  
Kêrdim pê tîj ken  
Ya deşê bimken:  
be rêzi çeqo  
Şewê bimçênin le naw dilî to.! ( rûp 22)

Gasin:	Gêsinê kolanê
Pirrşing:	Çirîskên agirî
Kellem:	Qafê serê min
Serenwêlk:	Sergîfk, cihê pîsatîyê tavênenê
Tûrr deden:	Dê havêjin, dê firrê din
Pêmerre:	Merbêl
Bêşke:	Landik, dargoş
Birrben:	Mivred, amîretê çeqo tîjkirinê
Ya deşê:	Ya dibe
Le naw:	li nav

BAX

Mecnûnim dî le Kabeya  
Her deynaland û degirya  
Deygot: Xwaye  
Le batî ewînî Leyla  
Towî eşqî nîştimanî  
Biçîne a lem dileya...

هەوالنامەی کتىپ

\*\*\*\*

Mecnûnim dî le Kabeya  
Le batî şîir bo Leyla  
Be xwêni dilî deynûsi:  
Her çend tikê xwêni geşî çewsaweyek  
Le ber textî Şayek derrjê  
Şûray zîndanêk derûxê  
Le sûçêkî biyabani em gerdûne baxêk depjê

\*\*\*\*

Mecnûnim dî le Kabeya  
Le batî wêney Leylakey  
Wêney darebenêkî qij helqirçawî em zewîyey  
Helwasî bû be yexeya... (rûp 33)

\*\*\*\*

Deynalî	
Toy: :	Tov
Le batî:	Li şûna, li cihê
Tikê xwên:	Dilopeka xwînê
Şûra:	Dîwar,
Derûxê:	Diheriife
Le sûçêkî:	Li qulaçekê
Dareben:	Kezan, dara benîştî dide
Helwasî bû:	Helawîstî bû
Be yexeya:	Bi yaxa wî ve

#### WIŞEY MINAL

Minal degrî, herwaş wişe,  
Firmesk degrê berî dîdey  
Minal qaqa pêdekenê  
Wişes weha depijê xendey.  
Minal hergîz be qisey hîç kesê nakat  
Wişes waye

هەوالنامەی کتىپ

Wişe û minal  
Gul debexşin bem dinyaye  
Çûn kiçêk dili dê  
Honrawey şairêk cêbêlê  
Ey çûn pasdarêk dili dê  
Be postal gilarey minalêk bişêlê.! ( rûp 37)

Wişe:	Peyv
Firmêsk:	Rondik, hêstir
Depijê:	Belav dibe
Xende:	Kenîn, girrnijîn
Debexşin:	Pêşkêş dikan
Honrawe:	Helbest, şîir
Gilare:	Çav
Bişêlê:	Bipeqîne, biteqîne

#### GULEGENIM Û BARAN

Wênenem kêşay le perreye bîckole da.  
Bon û beramey newbehar  
Seranserî zewî tenî  
Serincim da, bînîm lêwit  
Le ser lêwî perreke da.

هەوالنامەی کتىپ

Tirîq û hûrr pêdekenî.!  
Le perreye biçkole da nawim nûsî  
Çî balinney cîhan heye  
Be cêyan hêst aw û xerman  
Pol pol hemûyan be kipî  
Jorekeyan gemarodam wek bazineye  
Serincim da, bînîm pirçit le perre biçkolekem da  
Tel tel buwe be gulegenim û be baran...! (rûp 36)

Le perre:	Li ser rûpelekê
Berame:	Bêhna xwes
Tenî:	Dagirt, dapoşî
Le ser lêwî:	Li ser lêva
Nawtim nûsî:	Min navê te nivîsî
Xerman:	Bêder, coxîn
Pol pol:	Qol qol, birr birr
Be kipî:	Bi bêdengî
Gemarodam:	dûrpêç kirin, dûrûber girtin
Tel tel:	Dav dav

#### BO BABATAHIRÎ HEMEDANÎ

Le Xwat pirsi : Boçi her çî  
Xoşî heye le seranserî gişt gerdûn  
Deybexşête komelê kes.

هەوالنامەی کتىپ

Be sedan milyonîş zebûn  
Nanî coyîşyan nayete des...!  
\*\*\*

Xozget dexwast ke bot bilwê  
Em gerdûne wêrankeyt û  
Cîhanêtir sazkey le nwê...!  
\*\*\*

Em care le Xwa bipirse: Bo çî cerdekanî Tehran  
Bûkanî Hesen Zîrekyan  
Kird be wêraney naw lafaw?  
Bo Mehabadî Qazîyan  
Gilaw kird be tif û pêlaw.  
Lêy bipirse: Bo çeqoyan na le pirçî Kurdistan û  
Girryan berda le bîstan û çem û dolê.  
Hezar bare

Babatahîr:	Helbestvanekê kurdî gelek kevne
Deybexşête:	Pêşkêş dikî
Coyîşyan:	Cehî jî
Nayete des:	Nakeye di dest de
Bilwê:	Bigunce
Sazkey:	Ava bikey
Bûkan:	Bajarekê Kurdistana Îranê ye
Hesen Zîrek:	Stiranbêjekê bi navûdengê Kurdistana Îranê ye
Gilawkird:	Pîskir, herimand
Girryan berda:	Agir brerdan
Hezar bare:	Hezar car

Herdû dîdey Naxedeyan bo helkolî?  
Lêy bipirse: Bo minalî minaldanîş  
Derbaz nebû le postal û le zîndanîş.  
\*\*\*

Ey giyanekey Babatahîr  
Ey balindey qelender û dûr le zincîr  
Key şabalî xot lêk dedey  
Taranî kon be ser ew diz û cerdaney  
Ke şîirekanî Gulsorxî depirrûkênin  
Granî Merrabibûs û  
Gulaley ser gilkoy Qazî desotênin  
Her hemûy têkûpêk dedey.  
Daderêjî cîhanî nwê  
Lew endaze û şêweyey ke  
Ke xot detewê...! (rûp 57 - 58)

\*\*\*

Dîde:	Çav
Naxede:	Bajarekê Kurdistana Îranê ye
Helkolî:	Çava bi saxî derbîni
Minaldanîş:	Malbiçûk, cihê zarok tê de dirust dibe
Balinde:	Tewal, teyr

هەوالنامەی کتىپ

Qelender:	Feqîr, hejar
Şabal:	Şaper, perên tewala
Gulsorxî:	Helbestvan û şoreşgerekê Îranî bû,
şahî kuşt	
Merabibûs:	Helbesteka wî ya nemire û bûye
stiran jî	
Gilko:	Gor, qebir
Detewê:	Te divê

**EM RÛBARE WIŞK NAKAT**  
**( Dîwana helbestan 1991 )**

DILÎ ŞAİR

Xewim naye û espî xewim helimnagirê û  
 Şeqam be şeqam radekat  
 Diway dekewim  
 Le tırsî zirmey pêy min û  
 Xar û hîley espî xewim  
 Malan pencere dadexen

هەوالنامەی کتىپ

Malan bewe nazanin  
Ew denge deng û heraye  
Xewî rakirdûy şaire û  
Şairêk e xewî naye  
Malan gişt şitêk dezanin  
Ewe nebê: Şair kê ye  
Dili şair le jêr pêy kam nazdarda ye... (rûp 3)

Helimnagirê:	Min helnagire
Şeqam:	Cade, rê
Diway dekewim:	Li pey diçim
Zirme:	Dengê pê, pêjina pê
Dedexen:	Digirin
Heraye:	Hewar, qerebalix

TEWR

Lew sawe bot baskirdûm  
Ke hezit le sewzawiye  
Her çî wişem heye weku  
Qijî darî berrû sewzin.  
Le sawe ke pêt gutûm  
Ke hezit le berzayîye  
Her çî şîirim heye weku  
Hesarost û Zagros berz in.

هەوالنامەی کتىب

Le sawe ke bot dirkandûm  
Hezit le şestebarane  
Çî wişeme bûn be hewr  
Le sawe têt geyandûm  
Ke riqit le zordare  
Çî wişeme le ser milî  
Zordaran da, bûn be tewr... ( rûp 25)

Tewr:	Bivir
Lew sawe:	Ji wî demê
Sewzayî:	Keskatî
Qij:	Por, pirç
Berzayî:	Bilindahî
Hesarrost:	Çiyayekê bilinde li Kurdistan başûr
Zagros:	Çiyayekê bilinde li Kurdistanê
Riq:	Kerb, kîn

### BESERHATÎ ŞÜŞEY ETIR

- Ne beyannamey nihên û  
Ne serî piyawî ramyar û  
Min şûse etr im gulaw im  
Qaçit şikê  
Wek min xwên le dilit bitkê  
Boç bizmarî postaleket  
Çeqanduwete naw çawim.  
Çawit kwârbê  
Agir berbê le maleket  
Min bo jêr pêy to nekirawim.  
Min bo kezî û pirçî xawim  
Hey cergî daykit helqirçê  
Bo çî nethêst bigeme twêy  
Pirçî kiçê...  
Hey cergî daykit helqirçê... (rûp 44)

Şûşey erit:	Şûşa gulavê, bêhnê
Nihênî:	Nepenî, veşartî
Ramrî:	Siyasi, polotîk
Qaçit:	Pê te
Bitkê:	Birije
Kwêrbê:	Korebî
Helqirçê:	Bisoje, biêşe
Nethêşt:	Te ne hişt, nehêla

## DILIM

Dilim le sîngma nemawe  
 Le cêy dilim wêneyekî to danrawe  
 Cantakanit bipişkine  
 Melê gumanî le min e  
 Elêm newek wat zanîbê  
 Dilim şûşe ye gulawe  
 Bizane bew xeyalewe  
 Le sûçêkî cantayek da  
 Dat nenawe... (rûp 49)

هەوالنامەی کتىپ

Le cêy:	Li şûn, li cih
Bipişkine:	Têkvede, lê binêre
Suçêk:	Qulaç, alî
Dat nenawe:	Te ne deynabe

## NAVEROK

1. Pêşgotin . . . . .	5
2. Amadebûn bo ji dayikbûneka din . . . . .	27
3. Pora wê keçê konê deşt û zazanên min e . . . . .	34
4. Bahozâ spî . . . . .	47
5. Ew helbesta bi dawî tê û bi dawî nayê . . . . .	56
6. Ew namên ku diya min naxîne . . . . .	63
7. Siruda hejaran . . . . .	71
8. Ev rûbare hişk nabe . . . . .	77
9. Nameyek vekirî di pêşwaziya sala 1996 ê de . . . . .	87
10. Helbestêñ bi kurmanciya jêrî, lê bi tîpêñ latînî .	90
 Xoşewîstîm . . . . .	92
Dengî yekem . . . . .	94
Nameyekî nihêni bo pêşmegekan . . . . .	95
Reg . . . . .	97
Kew . . . . .	98
Şêt . . . . .	99
Seretay ewînêk . . . . .	100
Dilim honrawey lê debarê . . . . .	101
Nexşe . . . . .	102
Koşk . . . . .	103
Minal . . . . .	105
Giyan . . . . .	106
Destî şâîr . . . . .	107
Sorax . . . . .	108
Pêtan dekrê . . . . .	109

Tirs . . . . .	112
Bax . . . . .	113
Wişey minal . . . . .	114
Gulegenim û baran . . . . .	115
Babatahîrî Hemedanî . . . . .	116
Dilî şâîr . . . . .	119
Tewr . . . . .	120
Beserhatî şüşey etir . . . . .	121
Dilim . . . . .	122
Naverok . . . . .	123